


Berhemên Gıstî Yên Molière



tartuffe

Sofiyê Sextekar

Molière

crım

ŞANO



Sofiyekî sextekar ku malxwê malê ji dilê xwe yê saf pê bawer dibe û dixwaze pê re alîkariyê bike dikeve nav malbata Orgon; heta ku diz û xwediyê malê bi hev dihesin sofiyê min û te dixwe, vedixwe û bi rûyekî rûşûştî bela xwe di kevaniya malê dide.

Molière ku vê yekê dike mijara piyesa xwe, ji bo ku wê bi derdorên serayê û dêrê bide qebûlkirin heta sala 1669-an têdikoşe, ji ber ku gava cara pêşîn li Versaillesê tê nîşandan, piyes ji alî eynî derdoran ve weke piyeseke xeter tê dîtîn û demeke dirêj tê qedexekirin. Ger Molière bitenê durûtiyên softiyê jî teswîr bikira, gelo dê dîsa şik û şibhe nehata ser softiya rasteqîn?

Jixwe fêda û qezenca vê piyesê ewende mezin e ku; durûtiya nava mirov a ku li gor demê reng diguhere û bi awayekî din xwe nîşan dide jî derdixe meydanê. Lê Tartuffe her wiha jî komediyêke xwiya û kesayetiye ye, ku pêkeniya qebe hêdî hêdî ber bi diramê ve dibe û pê re pirr xweş harmonise dibe. Molière li vir bi hostayî û hunerê xwe yê ku mirov heyran û hişmetkar dihêle nîşan dide û bînerê ku saf saf bi heyecaneke pirr xweş dikene, jidil kêfxweş bûye ber bi fikr, hizir û ramanên pirr ciddî, yên kûr û dûr ve dibe.



Weşanên Aram

Berhemên Giştî Yê Molière: 1

Tartuffe

Molière

Wergera ji Fransî: Yakup Karademir

Weşanên Aram 40

© Weşanên Aram

Weşanên Aram: Nîsana 2002-yan

Amadekirina Ji Bo Çapê:

Ömer F. Kurhan - Yakup Karademir

Berg Sazî: Rauf Kösemen

Çapkirin û Cild: Berdan Matbaacılık

ISBN: 975-8242-42-3

Aram Yayıncılık

Keçi Hatun Mah. Millet Cad. No: 11/8

Aksaray İstanbul

Tel: 0212 530 61 74

Fax: 0212 529 94 32

Molière

Tartuffe

Sofiyê Sextekar

Wegera ji Fransî

Yakup Karademir

Aramşano

PÊŞGOTIN

Nivîskarê vê lîska teatral a pêkenî di pêşgotina xwe de li ser rewşa wê demê, êrîşên paşverû û kevneperestan ên li dijî komediya xwe û têkiliyên wê yên dîrokî bi dîn re rawestiya ye, ji bo wê jî dubarekirina vê yekê û şertên dema ku komediya *Tartuffe* an jî *Sofiyê Sextekar*, qiliç tê de hatiye nivîsîn ne pêdivî ye.

Tartuffe peyveke Fransî ye ku bi kurdî mana wê qiliç ango sofiyê derewîn, sextekar û durû ye. Ji ber êrîşên kevneperestan ev komedî gellek caran tê qedexekirin, lê Molière jî bi rik dixwaze wê bilîze. Ji bo vê jî piştî ku tê qedexekirin, navê wê diguhere dike L'Imposteur, cubbeyê dînî yê *Tartuffe* jê dike û qiyafetê salonê lê dike da ku wî careke din hîne ser sehnê.

Mana l'imposteur jî bi kurdî derewker, delewêreker û dolabgêr e. Lê qerekerê *Tartuffe* ne bitenê sextekar e, sextekarekî ku dixwaze mirov ji rê hibe û ew li dewsa mirov rûnê. Di civata me kurdan de jî kesên ku niyeta xwe ya rastî tim vedişêrin, bi derew û sextekariyan dixwazin piyê hevalê xwe bişemîtin û li dewsa wan rûnin pîr in. Kurd jî kesên wiha re dibêjin qiliç, çellaq, sextekar ji bo wê me jî xwest ku em peyva *Tartuffe* bikurdî weke *Sofiyê Sextekar* wergerînin.

Min navê ku ez li vir *Tartuffe* rexne bikim, ji ber ku rexnegiriya hunerî pisporiyeke taybetî divê, bila paşê aktor û hunermendên me yên ku bi teatrê mijûl dibin bîr û rayên xwe yên li ser vê komediyê bêjin. Wek kesekî ku piçekî bi zimannasiyê mijûl dibe, ez dixwazim hinekî li ser girîngiya werger û teatrê ya di warê ziman de rawestim.

Weşangerên me dibêjin ku xwendevanên kurd ji wergerê bêtir ji berhemên telîf hez dikin û wan tercîh dikin. Helbet ev tercîheke di cîhê xwe de ye, lê divê xwendevanê kurd zanibe ku Victor Hugo, Tolstoy, Balzac, Dostoyevski û Moliêrê kurdan tunene, divê mirov wan jî bixwîne.

Gava ku ez vê yekê dibêjim ne ku ez nivîskarên kurdan kêma dibînim, Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran ê Fransîzan, Rûsan û Ingilîzan jî tunene, divê ew jî wan bixwînin. Ev yek jî bitenê bi rîya wergerê mimkun e, nexwe herkes nikare her zimanî zanibe û telîfên orjînal bixwîne.

Lê di warê wergerê de avantajê kurdan heye, ku ji bo zimanê wan dezavantajê mezin e û nahêle ziman bi berhemên wergerê yên ji çandên din dewelemend bibe û bipêş keve.

Sedema vê jî ev e, ku her kurdek du zimanan zane: Kurdên bakur, li gel kurdî tirkî; yên başûr û başûrêrojava kurdî û erebî; yên rojhilat kurdî û farisî dizanin. Ji ber ku klasîk berî kurdî li van zimanan hatine wergerandin xwendevanên me yan ew bi van zimanan xwendine yan jî ji ber ku ev ziman di jiyana wan de serdestin, dîsa dixwazin bi van zimanan bixwînin.

Lê divê mirov jibîr neke, ku gava talibên wergera bi zimanê kurdî tunebin wê zimanê me ji berhemên klasîk mehrûm bimîne û dê wergerên bihêz ku karibin tama zimanê orjînal bidin jî pêk neyên. Ev yek jî wê zimanê me yê ku bised salan qedexekiri ye, zeif û lawaztir bike.

Ji aliyê din ve wek min li jorê jî bahskir, ez dibêim qey zanîna min a di warê teknîkên teatrê de ji ya bînerêkî sade ne bêtir e. Lê ji bo têkiliya ziman û teatrê çend peyvên min ên ku ez jî bêjim hene. Berhemên Teatral, ku werger jî bin, di warê pêşketina ziman de rolekî pir girîng dilîzin. Tew ku ev berhem komedî bin rola wan hîn bêtir û bitesîrtir e.

Ji bo fêrkirina ziman çendî dibistan û wasite hebin jî tiştek biqende skêç û piyeseke li ser sehnê an ekrana televîzyonê tesîrê li ji heft salî hete heftê saliyên civatê nake. Sehne an ekran weke

mirêka ku mirov tê re xwe bibîne ye. Lê di mirêkê re mirov tenê bi awayekî fizîkî xwe dibîne, belê li ser sehnê mirov dikare hemî zeaf û karebûna xwe ango rewşa xwe ya fizîkî û ruhî jî bibîne. Ji bo wê jî zimanê sehnê bihêzdar û bitesîrtir e, di mêjiyê mirov de zû cîh digrê û bi hêsanî nayê jibîrkirin.

Ku bivê mirov hinekî jî bahsa karekterên Molière bike, divê mirov hinekî şertên dema ku ew tê de jiyaye û rewşa edebiyatê ya wê clemê baş zanibe. Dema ku Molière tê de jiyaye dema feodaliyê ye û wê demê çeşnên edebî yên meqbûl destan, efsane û methiyê ne. Di van çeşnên edebî de ji zeafên mirovî hêtir taybetmendiyên baş û qenc ên mirovî derdikevin pêş.

Lê Molière berevajîya vê durûtî, sextekarî û çellaqîya mirovî ango zeafên mirovî di berhemên xwe de derxistine pêş û anîne ser sehnê ji bo vê ye, ku bûye armanca êrişên kevneperest û paşverûyan. Weke ku îro jî li paş perdeya hin îdealan hin mirov sextekarî, durûtî û hesûdiya xwe vedişêrin, wê demê jî li paş maskeya dîn hînan zeafên xwe veşartine, xwesitine hevalê xwe bixapînin û ew li ser mîratê wan rûnên.

Mêjiyê gundîtîyê hîn di civata me de jî serdest e, têkiliyên me hîn bitemamî ji axê qut nebûne, li paş xurûra me ya ku ji ber vê yekê tê gelek zeaf veşartî ne. Em tu carî rastiya xwe nabêjin û naxwazin ku kesek jî zanibe û bêje. Gava hinek bidostanî jî me rexne bikin, gelek caran ji ber xurûra xwe ya vala em wan dijmin îlan dikin û bi awayekî bêperwa êrişî wan dikin, wan aforoz dikin.

Ji bo wê jî werger, çapkirin û listina komediya *Tartuffe* di demeke wiha de tam îsabet e û wê weke lazerê zirxên ku em li paş zeafên xwe vedişêrin bihelîne û wan derxe holê.

Belbî bi saya berhemên wiha çanda demokrasiyê di nav civata me de jî pêş bikeve da ku em jî karibin pirsên xwe bi awayekî bêtirs û eşkere munaqeşe bikin û zeafên xwe jî mehkûm bikin, ne ku wan bincil bikin û veşêrin.

Yakup Karademir

PÊŞGOTINA MOLIÈRE

Eve komediyeye ku bi ser zimanan ketiye û ev serê demeke dirêj e ku neheqî lê hatiye kirin; û mirovên ku vê komediyê dilîzin nîşan didin ku ji komedyenên herî jîr û jêhatî yê Fransa ne, ku he-ta niha di lîskên min de rol sitendine. Jinên kulbar, mêrên ku ji alî jinên xwe ve hatine xapandin, markî û bijîşkên ku em wan li ser sahnê temsîl dikin, û li pêş çavê herkesî em îmajên welê didin wan weke ku henekê xwe bi wan bikin, bi dilekî rihet tahmûla me dikin; lê kesên durû qet ji henekan fêr nakin: wê gavikê vediciniqin, ditirsin, û li cesareta min a ku ez durûtiya wan derdixim holê, henekê xwe pê dikim û hunerekî rexnegirî yê ku gelek mirovên dirist jî tê de cîh digirin pêk tînin şaş dimînin. Ev helwesta wan cinayetêke wiha ye ku tucarî nayê efûkirin; wan li dijî komediya min bi awayekî harîhêberî çek û rextên xwe girêdane ku pîrçûnekan bi canê mirov dixin. Tu mahsûra ku bitenê ji aliyê wan ku dêşîne de êrîş bikin jî nabînin: Lê vê yekê pîr biqurnazî dikin, û ji bo niyeta xwe ya rastî jî eşkere nekin, pîr bimaharet in. Weke em dibînin ku hergav dikin, herjevendiyên xwe yê şexsî li paş perda doza dîn vedîşêrin; û *Tartuffe*, weke piyeseke ku heqaretê li dîn dike biser dev û zimanan dixin. Li gorî wan ew ji serî hete binî tije xerabî û kirêtî ye, û divê tevî nivîskarê xwe bisaxî di nav agirê sor de bê şewitandin. Dîsa dibêjin ku her kiteyeye wê li dijî ehlên Xwedê ye; her jêsteke wê cinayetek e; her çavkirineke wê, her serhejandineke, her gaveke wê ya piçûk a ber bi çepê an ber bi rastê de maneyeye wê heye. Bi vî awayî li mahneyeke perrîtî digerin ku li dijî min bikar bînin. Li gorî wan ez wê beleheq pêşkêşî rexneyên hevalên xwe, û nîrxandinên herkesî dikim. Sererastkirinên ku min karibûn bikirana, nîrxandina qirêl û qiraliçeyê, ku berî lê nêrîbûn, teqdîra mîrên mezin û wezîran, ku li pêş çavên herkesî, dema nî-

şandanê amade bûn, şadetiya qencên xwedê, ku ew wek tiştêkî bifêde dîtin, ev hemî bikêrî tiştêkî nayên. Piştî van tiştan hemiyan jî ew qet naxwazin ji ser yek û duduya xwe bên xwarê; û hîn jî, her roj li nav xelkê bi awayekî bêmane dikin qîrîn û hawar, tevî softiya xwe heqaretê li min dikin û jî Xwedê dixwazin ku ez bi agirê cahnimê bişewitim.

Ev propagandayên wan ên welê qet ne li ser guhekî min in jî, ev handana wan ji dek û dolabên ku dixwazin min wek dijminê kesên ku rêz û hinmeta min ji wan re heye nîşan bidin û mominên rasteqîn bikşînin aliyê xwe, niyeta wan a paqij îstîsmar bikin pê ve ne tiştêkî din e. Ev kes biheraret dibêjin ku ew hertiştî ji bo xatirê Xwedê dikin û bi vî awayî bihêsanî heşê qencên xwedê ji serê wan dibin. Ewe ji ber vê yekê divê ku ez jî xwe ji êrîşên van bêbextan biparêzim. Ji bo birêvebirina komediya xwe, ji dîndarên rasteqîn re di bin her şert û mercî de ez dikarim îsbat bikim ku ez ne neheq im; û ez ji dil û can ji wan ricayê dikim ku divê berî tiştêkî bibînin wî tawanbar nekin, xwe ji her cure hukmê pêşîn biparêzin û qet nekevin bin tesîra azweriya wan kesên ku bi durûtiya xwe, xwe bêrûmet dikin.

Ger ku mirov zahmet bike biniyeteke paqij komediya min binirxîne, bêşik mirov dê bihêsanî bibîne ku min hertiştî bi niyeteke paqij kiriye, û qet tiştêkî welê di heşê min re derbas nebûye ku ez henekê xwe bi tiştên pîroz bikim; di vî warî de çi tedbîreke ku ji bo hesasiyeta mijarê ji min bê xwestin ez amade me ku minaqeşe bikim û nîşan bidim ku ji bo kesên durû û mominên rasteqîn ji hev cuda bikim tiştê ku ji destê min hatiye min bêtêmasî kiriye. Ji bo vê jî min du perdeyên temam bikar anîne da ku Beko Ewanê xwe bi awayekî rêkûpêk pêşkêş bikim. Ew carekê bitenê jî guhdêr di teredutê de nahêle; ew ji serî de bi îmajê ku min dayiyê tê naskirin; û ji serî heta binî jî bo mirovê qencê Xwedê yê rasteqîn ku min li hemberî wî daniye derxe ortê peyvek jî ji devê wî dernakeve, tiştêkî jî nake.

Ez baş dizanim ku ji bo bersiva van kesên ku ev yek kirine benîştê devê xwe û dibêjin ku cîhê xeberdana vê meselê ne teatro ye divê mirov çi bike; lê bi misada wan be, ez ê bitenê vê bêjim, bi

çi heqî van peyvên welê xweşik dibêjin. Ev pêşniyazeke ku wan ji ber xwe ve çêkiriye û bi tu awayî jî nikarin îsbata wê bikin; û helbet bi hêsanî mirov dikare nîşanî wan bide ku, ji berê û paşê de, kaniya komediyê dîn bûye; û komedî beşek ji lîskên dînî yên wê demê ku mijara wan jiyana mirov bûye; weke ku tê zanîn li cem cîranên me, îspaniyan, kes cejnê bêkomedî pîroz nake, û hete li nav me jî li cem terîqetêke kevn ku hîn îro jî ji aliyê derdora Hotel de Bourgogne ve tê paraztin derdikeve ortê, ku ev der ciyekî welê bû ku ji bo nîşandana lîskên dîne me yên herî binavûdeng hatibû terxan kirin; û îro jî mirov dikare komediyên ku bi herfên gotîk, ku bi navê doktorê Sorbon* hatine nivîsîn li wir peyda bike; û ne hewcê ye ku em zêde dûr herrin, îro jî piyêsên dînî yên M. de Corneille**, ku hemî Fransa heyranê wan e li wir tîn nîşandan.

Ger ku bikaranîna komediyê ji bo temamkirina kêmasî û qusûrên mirovî be, ez tu sedemê ji bo ku hin bixwazin kes bahsa wan neke nabînim. Ev kes, ji herkesî bêtir di rewşeke welê de ne ku encamên wê dikarin pirr bixeter bin; wê gavê diyar e ku ji bo ji holê rakirina vê rewşa bixeter teatr dikare rolekî pirr girîng û birûmet bilîze. Ravekirina herî baş a exlaqekî ciddî, gellek çaran, ji helbestên rexnegirî bêtir, bi riya komediyê hêsantir û bitesîrtir dibe; û tu tiştêk biqendî pêkanîna dîmenê kêmasiya mirov, li mirov tesîr nake û bikêrî mirov nayê. Tiştêk biqendî dema ku hinek kêmasiyên mirov hînen pêş çavên herkesî û herkes bi wan bikene tesîrê li mirov nake. Mirov ji rexnekirinê bihêsanî aciz dibe, dêşe; lê bi henekan qet naêşe. Mirov dikare bixwaze xerabiyê bike, lê mirov qet naxwaze bibe pêkeniyê tukesî.

Ji ber ku qiliçê min hin termên dînî bilêv dike bi min re dixeyidin, min tawanbar dikin. Ji bo ku min karakterê durûtî û çellaqiyê nîşan bidana, gello min karibû xwe ji tiştêkî welê biparazta û nekirin? Bi min wiha xwiyaye ku ji bo bi zorê mirov karibûna mîzacekî xirab bidanayê, min termên pîroz jê derxista û li şûna wan min motîfên cîneyetê jî daniya da ku pê hîn tişt bidana gotin dîsa jî têr dikir. Lê di perdeya çaran de exlaq û namûseke sist tê ravekirin. Be-

* Jean Michel, doktorê tibê, nivîskarê *Le Mystère de la Passion* ku çapa wê ya sala 1490-î heye û *Résurrection* ku tu tarîx li ser tuneye.

** Polyeucte (1643), Théodore vierge et martyre (1646)

lê ev exlaq tişteki ku qet guhê kesî lê nebûye gelo? Mana xwe tişteki nû di komediya min de tune? Aya mirov dikare ji tişteki ku bi awayekî giştî herkesê jê nefret dike, ji her ku min ew derxistiye ser sahna teatrê û bi devê çellaqekî çend peyv li ser kirine bitirse? Tişteki welê ne mimkun e; ku yan mirov komediya Tartuffe bicibîne, yan jî hemî komediyan bi awayekî giştî mahkûm bike.

Ev demeke dirêj e ku mirov bi teatroyê ve hatiye girêdan û tu carî bi vî awayî li dijî wê derneketiye. Ez nikarim bidim mandelê ku Metranên Dêrê li dijî komediya derneketine; lê her wiha jî kesek nikare ji min re bêje ku hinan ji wan jî berevajiya wê ew bi awayekî pozîtîf nenixandine. Bi vî awayî otorîteya ku xwe sipartibû sursurê ji hev de ket û têk çû. Encama ku divê mirov ji van bîr û rayên rengareng ên mêjiyên ronî ku bi eynî roniyê ronî bûne derxe, ev e ku wan bi çavekî din li komediya nêniye; hinan ji wan ew bi paqijî û safitiya wê qebûl kirine, hinan jî bi çavekî xirab lê nêrine û ew bi van dîmenên pis tevlihev kirine ku mafê mirov heye wan bi dîmenên rezil binav bike.

Birastî jî, piştî ku divê mirov di derbarê tiştan de bipeyive û hin peyvan bikar nêne, û mirov bêje qey hemî dîtinên dijberî hev ji her ku mirov ji hev têngahê pêk tînin û tiştên dijberî hev têxe qalibê eynî peyvê wê gavê divê mirov perda gûmanê rake û binêre bê komedî bixwe hêja ye ku mirov wê mehkûm bike yan na. Wê gavê mirov dê bi awayekî zelal bibîne ku, ji hebbesteke ku bi hosteyî li hev hatiye anîn pê ve ne tişteki din e ku bi dersên xweş şasiyên mirov ji navê radike û divê mirov wê bi awayekî bêînsaf sursur neke. Ger ku em bixwazin bi ser de jî nimûneyên dema Entîk bidin, dê derkeve holê ku filozofên navdartirîn ên wê demê zanîneke pirr sade ji xwe re kiribûn kar û li pey xerabiyên dema xwe her bitirs bûn. wan jî her pesnê komediya dane. Dîsa wê demê em dibînin ku Arîsto giraniya xelbata xwe daye teatroyê û hete ji destê wî hatiye drama kiriyê qaîdeyê bingehîn ê huner. Em dibînin ku mirovên herî navdar û yê xwedî rêz ên wê demê bixwe jî, bi pêkanîna wê pesnê xwe dane, hinan ji wan jî tenezul nekirine ku berhemên xwe li pêş herkesî ravekin. Gelê Yûnan wê demê rêz û giraniya xwe ya li hember vî hunerî bi xelat û diyariyên mezin û pêkanîna sehneyên teatrê yê super nîşan daye. Paşê li Romayê jî

qîmet û hurmeteke mezin ji vî hunerî re hatiye nîşandan. Helbet ez bahsa Romaya sefîh a di bin nîrê împeretoriyê de nakim, ez bahsa Romaya bi nîzam û dîsîplîn a dema konsulan ku xwedî hêzeke birûmet a romayîyan hû dikim.

Divê mirov bêje hin demên ku komedî xirabûbû ji hene. Lê herroj li ser rûyê dinyê tişteki ku xera nebe heye gello? Tişteki welê bêguneh tuneye ku mirov nikaribe gunehan lê bike, tu hunereki ewende bifêde tuneye ku nikaribe daxwaza mirov bi awayekî din biguherîne, tişteki welê baş tuneye ku mîzacê xerab bixwe biguherîne ser mîzacê qenc û baş. Bijişki hunereki baş, bifêde ye û herkes weke tiştê herî baş ê mirovatiyê rêza wê digre; lê di dema me de carinan ewende hiletê mirov dibê û dibê hunereki jahirkirina mirov ku nayê wesif danê. Felsefe ji bo me diyariyeke Xwedê ye; Wî ew ji me re ji bo heşê me bi rîya fikra hebûna herîqeyên sursûtî, hebûna wî fêhm bike şandiye; û tevî vê ji mirov nizane ku mirov dê dîsa bi bikaranîna wê ji Xwedê bidûr keve û bi awayekî vekirî pê bi piştgiriya bêdînîtiyê mijûl bibe. Tiştên herî pîroz ji qet ji ber destê xerabiya mirovî nafilitin; û mirov herdem dikare li bêmerhemetên ku dîn ji bo berjevendiyên xwe yê şexsî bikar anîne rast bê, ku wî bi awayekî pîr kirêt ji bo gunehên herî mezin bikar tînin. Lê em ê fersendê nedin wan ku ji xwe re rîyeke wiha bibijêrin. Bi gelemperîkirineke xapînok, em ê qet tiştan tevîhev nekin, başî û qenciya tiştan bi xirabiya xirabkaran re tevîhev nekin. Bi rîya huner mirov dikare nîyeta pak û xerab ji hev derxe; ku qet hayê mirov ji paraztîna bijîşkiya ku ji Roma hotibû avêtin, ne ji ji felsefeya ku li Atîna bi awayekî vekirî hatibû mahkumkirin tunebe ji, ku carinan bê sansurkirin ji, divê mirov qet qedexekirina komediyê nexwaze. Belbî wê demê sebebên sensurê hebûn, lê di rewşa îro de kes nikare qet bahsa sebebên wiha bike. Helbet çarçoveyêke sensurê ji heye; mirov nikare wê derxe dervî sînorên wê yê diyar kirî, gava ku pêdiviya mirov pê tunebe, navê ku mirov qewara wê zêde fireh bike ku terr û hişk tevde bi agirê wê bişewite. Komediya ku bi nîyeta êrişkirinê hatiye amadekirin ne komediya ku ez diparêzim e. Divê mirov xwe baş ji tevîhevkirina van herdu cûre komediyan biparêze. Ev herdu weke du mirovên qerekerê wan zidî hev be ne. Di navbera herduyan de ji xeynî wekheviya nav, tu

tékiliyeke din tuneye; mahkûmkirina jina dîndar Olympe, ji ber hebûna jineke fahişe binavê Olympe dê bêdadiyeke erjeng ku tucarî neyê efukirin be. Mahkûmkirineke xiyabî ya wek vê, bêgûman, dê li ser rûyê dinyê bibê sedemê tevliheviyeke mezin. Bi vî awayî dê tiştêkî ku ji ber tawanbarkirinê bifilite nemîne; û piştî mirov li hemberî tiştên ku herroj mirov bi wan dixape jî helwesteke wiha diwar nastîne. divê mirov eynî helwestê li heber komediyê jî bistîne, û heq bide piyesên teatral ên ku mirov tê de zanîn û rûmetê dibîne.

Ez dizanim espîriyên welê hene, ku zerafeta wan nikare zirarê bide tu komediyê. Ew dibêjin ku kesên herî birûmet yê herî xeter in. Azweriyên ku li wir tèn teswîr kirin ewende pîrr bitesîrin ku dilê mirov rihet dikin. Ku mirov jîdil xwe bide azweriyekê ne gunehê. Ev mertelbeya herî bilind e, ku li hemberî ewende bêhesasiyete kesayetiya mirov berz dike. Ez ji hebûna dilpakîyeke ewende mezin di ruhîyeta mirov de bişik im. Ez nizanim gello ne çêtir e, ku li şûna mirov azweriyên mirovî jî binî de jê bike bavêje, han bide da ku wan nem bike û bîne ser rîyeke baş. Ez qebûl dikim cîhên hîn çêtir ji teatî hene ku divê mirov biçiyê. Ger bivê mirov hemî tiştên ku rasterast ne ji bo Xwedê û noşdariya mirov bin weke guneh bihesibîne, bêgûman wê gavê komedî jî sûc e û ez tu mahzûra mahkûmkirina wê jî ligel sûcên din nabînim. Lê em ferz bikin, ku ev yek rast e, û ku îtaeta ji bo dîn ferqa navbera mirov û yê dîn diparêze û pêdiviya mirov bi şayiya navbera her perdê heye, ez îdîa dikim ku yek ji van jî biqendî komediyê bêguneh nayê dîtin. Ne hewcê ye ku ez zêde dûr herim. Ez ê axavtina xwe bi bipeyva mîrekî mezin a li ser komediya Tartuffe bidawî bînim.

Piştî ku hate qedexê kirin bi heşt rojan, li pêşberî mehkemê piyeseke binavê *Scaramouche ermite* hate pêşkêş kirin, û qîral, li derketinê, ji mîrê mezin re got ku ez dixwazim zanibim: "Çima xelkê ku ji bo komediya Molière ewende rezalet derxist ji bo ya *Scaramouche* peyvek jî ji devê wan derneket." Mîr çawa bersiva wî dabe baş e: "Sehêbê vê yekê ew e ku komediya *Scaramouche* li ser navê dîn û Xwedê dilîze, ji bo vê jî kesek jê şikê nake; lê ya Molière wan bixwe tîne ser sehnê; ji ber vê tehemûla wan jê re tuneye."

AKTOR

SITÎ PERNELLE, diya Orgon.

ORGON, mêrê Elmire.

ELMIRE, jina Orgon.

DAMIS, lawê Orgon.

MARIANE, keça Orgon û evîndara Valere.

VALÈRE, evîndarê Mariane

CLÉANTE, bûrayê Orgon.

TARTUFFE (Qilîç), sofiyê sextekar

DORINE, qewraşa Marianê

MÎRZA LOYAL, çawîş

FLIPOTE, zeptiyeyekî xulamê sitî Pernelle

Bûyer li Parisê li mala Orgon derbas dibe

PERDEYA YEKÊ

Sehneya Yekê

*(Sîtî Pernelle û xulamê wê Filipote,
Elmire, Mariane, Dorine, Damis, Cléante)*

SITÎ PERNELLE

Bilezîne Filipote, heydê bilezîne, ku ez ji van xelas bim.

ELMIRE

Tu ewende bilez dimeşî ku kes nikare bi te re bigihê.

SITÎ PERNELLE

Bes e, hûkê, bes e, xwe aciz meke:
Min navê ku tu serê min mezin bikî.

ELMIRE

Bitenê min xwestibû ez wezîfa xwe ya li hemberî te pêk bînin.
Lê, dayê, ji ku îcab kir ku tu ewende zû çûyî?

SITÎ PERNELLE

Ji ber ku ez nikarim malê di vî halî de bibînim, ez li vir im an ne li vir im ne li ser guhê kesekî ye. Erê, tu li ber çavê min reş hû-yî: Min çi got te berevajîya wê kir, kes rêza tişteki nagre, herkes dibê ez, ev der bi rastî jî hûye mala zarokan, difna herkesî ber bi aliyekî ve ye.

DORINE

Erê lê...

SITÎ PERNELLE

Tu, rinda min, keçeke qewraş î.
Hinekî jî pirr zimandirêjîyan dikî, û heddê xwe nizanî:
Difna xwe dixî her tiştî, di her girarê de dikelî.

DAMIS

Lê...

SITÎ PERNELLE

Tu lawê min, bi rastî jî ehmeçekî dera hanê yî;
Ez ji te re vê yekê dibêjim, ez dapîra te;
Min sed carî ji lawê xwe re, ji wî metehê bavê te re got,
Her ku diçe tu nehs dibî,
Tu yê jê re. ji serêşiyê pê ve tişteki din çê nekî.

MARIANE

Ez dibêm ku...

SITÎ PERNELLE

Tu Xwedê, keça min, wek hay û bayê te ji tişteki tune, û
Û tu wiha xwe ji binî derdixî,
yê ku nizanibe wê bêje qey tu amîtam î;
Lê weke dibêjin, "Ji ava hêdeng bitirse,
ne ji ava bixwişexwiş û bilemelem",
Tu ava bin kayê yî, ez ji tiştê wiha nefret dikim.

ELMIRE

Wî, dayê...

SITÎ PERNELLE

Bûkê, diya min li dilê xwe megre lê,
Hal û hereketên te qet bi min xweş nayên;
Diviya tu ji wan re hûbûya numûneyeke baş,
Gorbuhuşta diya wan di vî warî de ji te jêhatîr bû.
Tu destbela yî; û ev rewşa te dilê min dêşîne,

Tu çi wek banûyan li xwe dikî, bi xwe vedikî.
 Jina ku bixwaze bitenê xwe bi mêrê xwe şêrîn bike,
 Bûka min, divê pêdiviya wê bi ewende xeml û xêzê tunebe.

CLÉANTE

Lê, Stî, piştî hemî tiştî...

SITÍ PERNELLE

Tu jî, birayê bûkê,
 Tu kurrekî pirr baş î, ez ji te hez dikim,
 hirmeta min ji te re heye;
 Lê dîsa jî, ku ez li şûna mêrê wê, kurrê xwe bûma,
 Min ê nehiştta ku çareke din piyê te bi vê malê,
 bi van sî û sitaran bikeve.
 Tu di derbarê jîyanê de bêrawestan hin peyvan dibêjî,
 Ku kesê heşê wî li serê wî be divê qet guhdariya wan neke.
 Ez hinekî li rûyê te dibêjim; ez çi bikim tebiêtê min wiha ye,
 Tiştê ku bi min zor bê, ez nikarim tehemîia wî bikim.

DAMIS

Mîrza Tartuffê te dê bi vê yekê pirr kêfxweş bibe bêşik...

SITÍ PERNELLE

Mîrovekî xêrxwaz e, divê mirov guhdariya wî bike;
 Gava ku ez dibînim sergermekî wek te paşgotiniya wî dike,
 Ez pirrî pê dêşim û hîletê min dere.

DAMIS

Çi? Ez ê tehemilî zimandirêjekî wek vî çelaqê
 Ku dixwaze hikim li vê malê hemiyî bike bikim,
 Bêyî ku begzade îzna me bide,
 Em ê nikaribin li mala xwe jî bipeyivin.

DORINE

Ger bivê ku mirov guhdariya wî bike û bi gotinên wî bawer be,

Wê gavê her tiştê ku mirov li vê malê dike sûc e;
Ji ber ku tiştêkî ev zimandirêj kontrol neke tune.

SITÍ PERNELLE

Her tiştê ku kontrol dike jî biheqî kontrol dike.
Ji ber ku ew dixwaze rîya xêrê bi ber we xe,
Ji bo hûn jê hez bikin jî, lawê min divê we hemiyar îkna bike.

DAMIS

Na, binêre, dapîrê, ne bavê min ne jî kesekî din
nikare min mecbûr bike,
Ku ez fikra xwe ya di derbarê wî de biguherim:
Wekî din ez çî bêjim dê derew be;
Tevger û tepeşa wî herdem min aciz dike,
dawiya vê yekê dê xirab be;
Xwiyaye dê rojekê serê min
bi vî mênîkê weke fisa şeytên re bikeve belayê.

DORINE

Helbet, gava parsekekî biyanî, pêxwas û tazî bê vê malê,
Xwe weke xwediyê malê bibîne û îro heddê xwe nizanibe,
Rê li ber herkesî bigre û axetiyê li ser serê me bike,
Şermeke mezin e, rezalet e.

SITÍ PERNELLE

Wî! Mala derewan bişewite, ku we guhdariya wî bikira
niha halê we ne ev hal bûna, hûn ê bi halekî din bûna.

DORINE

Te ew li ba xwe kiriye şêx:
Bawer be, ji durûtî û çellaqiyê pê ve bikêrî tiştêkî din nayê.

SITÍ PERNELLE

Hela tu jî xwe re li zimanê wê yê dirêj binêrin!

DORINE

Ku tu ji min bipirsî, bêkefil,
Ez ne bi wî ne jî bi xulamê wî Laurent bawer dibim.

SITÎ PERNELLE

Ez nizanim xulamê wî kî ye, çi kes e,
Lê ez kefilê efendî me, ez dizanim ku mirovekî baş e.
Ji ber ku çivên we rast dike û rastiye dide rûyê we,
Hûn miselletî ser wî bûne û xerabiya wî dixwazin.
Ew bitenê li dijî gunehkaran tê xezebê,
Xezeba wî jî ji ber baweriya we ya bi Xwedê ye.

DORINE

Baş e; lê bitaybetî çima van rojên dawin,
Tehemila hin kesên ku ji niyeta xwe ya saf tî vir nake?
Çi zirara seredaneke ji niyeta pak li Xwedê dibê,
Ku qerebalixiyê dike, ser û guhan ji me dike?
Bila di navbera me de be, tu dixwazî fikra min a di vî warî de hîn
bibî?
Ku hûn ji min bipirsin ew, ji Sitiyê diheside

SITÎ PERNELLE

Hiş be, û peyvên ku ji devê te derdikevin bila guhê te bibihîze.
Kesê ku ev seredan pê nexweş in ne bitenê ew e.
Ew hengameya kesên ku hûn hev dibînin,
Ew faytonên ku ji ber deriyê jêr kêr nabin,
Û heytêhola seysisên wan
Dibe sebebê paşgotiniyê li cem car û cîranan.
Min jî dixwest bawer bikim ku tiştek nebe;
Lê devê xelkê ne doxîna mirov e, ma ne şerm û fedî ye.

CLÉANTE

Êê! Ma qey tu yê li ber devê xelkê bî, Sitî?
Ku herkesî ji ber paşgotiniya xelkê
Dev ji dostên xwe yên herî baş berdana

Dê halê me çî hûna!
Ger ku mirov dev ji dostên xwe berde jî,
Tu bawer dikî ku dê dinya hemî devê xwe bigre?
Kesek nikare rê li ber paşgotiniyê bigre.
Ka em qet guh nedin van zimandirêjên xêv û bêrêz;
Têkilî tiştêkî nebin û bêguneh bijîn,
Fesad û zimandirêj çî dibêjin bila bêjin!

DORINE

Daphnéya cîrana me û dostikê wê nebin
Yên ku bixirabî paşgotiniya me dikin?
Jixwe kesên ku tevgera wan bêtir mijara pêkenînê ye
Ji herkesî bêtir henekên xwe bi mirov dikin;
Kesên wiha fersenda nîşana têkiliyeke nejidil jî tucarî bernadin,
Tiştan ji ber xwe ve mezin dikin,
bikêf û eşq li vî alî wî alî dibêjin,
Bi vî awayî dixwazin xwe li pêş çavên mirov qenc bikin:
Dixwazin pêwendiyekê di navbera tevgera hinekan
û dolabên xwe de bibînin,
Da ku dek û dolabên xwe pê bişon
û xwe ji nefreta alemê xelas bikin.

SITÎ PERNELLE

Ev tiştên ku tu dibêjî bêfêde ne, rastiyê naguherin.
Herkes dizane ku awayê jiyana Orantê
dikare ji alemê re bibe nimûne:
Radibe, rûdinê ji Xwedê re dia dike; û ji min re gotin ku,
Ew ji mêvanên tên û diçin jî pîr bêzar bûye.

DORINE

Birastî jî nimûneyek e, ku mirov lê heyran dimîne,
Peyva min ji başî û qenciya sitiyê re jî tune!
Wek jineke kemlan û giran dijî, ew jî rast e;
Lê ev xîreta wê divê ji ber pêşketina temenê wê be,
Bivê nevē dê jiyaneke aram bibuhêre.

Dema liserxwe hû û herkesî qedrê wê digirt,
 Ji xweşikbûn û ciwaniya xwe heta tu bêjî bes îstifade kir,
 Lê dema dît ku rohnîya çavê wê kiz dibê,
 Xwest dûrî kesên ku paşê xwe danê here,
 Li paş perdeya bihelahop a rûmeteke paqij
 Xwest xweşikbûna xwe ya ku êdî bikêrî tişteki nedihat veşêre.
 Ev poşmaniyên aşifteyên demê ne.
 Quthûna təkiliya mêrên nazik û kulbar bi wan zor tê.
 Gava li pêşberî rewşeke wiha dikevin endîşeyeke kûr û dûr
 Ji kemlanbûn û giranbûnê pê ve rîyeke din li ber wan namîne;
 Ev jinên ku bidev xêrxwaz û baş in, ji ber hidet û şideta xwe,
 Hertiştî dixin bin kontrola xwe û tişteki tehemil nakin;
 Ji ber ku temenê wan ê pêşketî,
 Wan ji zewq û sefa kesên din dibuhêrin bêpar dihêle
 Devê xwe tavêjin jiyana taybetî ya kesên din,
 Nexwe ev yek ne ji ber merhemet û dilovaniya wan e.

SITÎ PERNELLE

Çi çirokên xweş divê bi te jî xweş bên, hûka min.
 Bûkê, li mala te mirov mecbûr dinîne ku devê xwe bigre,
 Ji ber ku Xanima malê di warê pîrgotinê de
 ji sibê heta êvarî rê nade kesî.
 Lê di encamê de, li vê malê mafê min jî heye ku ez bipeyivim:
 Ez ji te re dibêjim ku lawê min heta niha
 Nikaribû biaqiliyeke weke anîna nav malê ya vî sofîyî bikira;
 Qey Xwedê ew ji bo fikrên we yên nelirê bîne ser rîya heq şand;
 Ji bo saxî û silametiya xwe divê hûn guhdariya wî bikin,
 Ji ber ku ew dizanê ku wê bi kê re bixeyide û bi kê re nexeyide.
 Ev seredan, ev balo û munaqeşe
 Hemî îcada şeytên in.
 Di van civînan de qet kesek bahsa dîn nake:
 Bitenê fikrên vala, sitran û laqirdiyên bêmane tên gotin.
 Di van gotinan de bitevayî para cîranan jî heye,
 Ê qet nebe hinekî paşgotîniya wan jî tê kirin.
 Welhasil di civînên wiha de,

Mirovê heşê wî li serê wî be jî gêj dibê.
Gava tiştek li meydanê tunebe jî hezar jimandirêjî
û paşgotinî tên kirin.
Û weke wê rojê zanayekî jî tam di cihê wê de got,
Vê derê hûye birca Babîl a rastî,
Ji ber ku ji her seriyekî sewtek derdikeve;
Gava em bên ser hûyera ku
zanayê me meebûr kiriye vê çîrokê bêje...
Eve dîsa ji niha ve Mîrza dest bi henekpêkirinê kir!
Heydê biçin qeşmerên ku we dikenînin bigrin bînin,
Û bêyî... Bixatirê te, hûka min: Ez naxwazim tiştekî din bêjim.
Zanîbin ku dilovaniya min a li hember vê malê nêvî nêvî kêr bû,
Heta ku hûn heşê xwe nedin serê xwe dê piyê min bi vê malê
nekeve.

(Li bayê xwe şeqamek li Filîpote da.)

Heydê tu jî, bimeşe, tu di xew ve derî,
Te devê xwe jihev kiriye li hewa dinêrî.
Xwedê bela te bide!
Ku min guhê te firkand dê heşê te bê serê te.
Bimeşe, hûmo, heydê em biçin.

Sehneya Dudûyan
(Cléante, Dorine)

CLÉANTE

Ji tîrsa ku em ê dîsa bi hev re şer bikin
Ez qet naxwazim biçim mala wan,
Ez naxwazim dîsa çav li wê pîra zirrik bikevim...

DORINE

Ax! Bîrastî jî nizane ku tu di derheqê wê de wiha xeber didî
Baş e ku dengê te nabihîze:
Dê ji te re jî bigota ku tu ji ser xwe çûyî,

Û ku ew ewende pîr nebûye ku tu navekî wiha lê bikî.

CLÉANTE

Çawa ji tune de bi ser me de hêrs bû!
Çendî bi ser Tartuffê xwe de jî dimre!

DORINE

Tew! Tiştê ku ew dike birastî jî
ji ber yê ku lawê wê dike ve ne tişteke e,
Ku te ew bidîta, te yê bigota: "Ew hîn jî jê xirabtir e!"
Bi saya şîretên me hinekî bi ser heşê xwe de hatibû,
Û ji nû ve bala qirêl kişandibû ser xwe;
Lê piştî ku Tartuffe heşê wî ji serê wî bir,
Dîsa bû gêj û sersemekî dera hanê;
Jê re dibêje hira, û wî bi kesî nade
Ji kurr, keç û jina xwe sed carî bêtir, ji dil û can jê hez dike.
Hemî sîrên xwe bitenê ji Tartuffe re dibêje
Û tevgera wî jî dîsa birêberiya wî rêberê bihizir e;
Destê xwe di serê wî dide, wî himêz dike, ez dibêm qey bitenê
Ji bo dost û yara xwe mirov dikare ewende bihîmet
û muhebet be;
Li ser masê, dixwaze ku ew hertim li serê sîfrê rûniştî be;
Dixwaze ku xwarina şeş kesan, ji serî çav para wî be;
Pariyê xweş hertim yê dostê wî be;
Dema qulpîka wî hiltê, "Noşîcan be!", dibêje.

(Xulamek dipeyive.)

Welhasil li ser wî dîn dibe; ew hertiştê wî, mêrxasê wî ye;
Heyranê her tevgera wî ye, herdem ew nimûneya wî ye;
Karê herî bêqîmet ê ku ew dike ji bo wî mûcîze ye,
Her peyva devê wî ji bo lawê pîrê wehî ye.
Qilîç ew xistiye qûs û qesef, her dixwaze pê hilîze,
Xwe ji şiklekî dixwe şiklekî heş ji serê wî dibe;
Bi saya durûtiya xwe hertim perên wî didize
Û mafê rexnekirina me hemiyar bi xwe re dibîne.

Ew sersemê xulamê wî jî
Dixwaze aqil bifroşe me;
Bi çavên xwe yên zurr awiran dide û şîretan li me dike,
Qurdêlên me, sorav û deqên me yên çêkirî digre davêje.
Wî nemerdlî, roja borî,
Destnaleke ku di nav pirtûka Fleur des Saints de dî,
Bi mahna ku em, weke tawaneke mezin,
Tiştên pîroz û xemla şeytên tevlihev dikin çîrçîrî kir çirand.

Sehneya Sisiyan
(*Elmire, Mariane, Damis,*
Cléante, Dorine)

ELMIRE

Ji ber ku hûn nehatin we axavtina li ber derî guhdarî nekir
Divê hûn pîr şad û bextewer bin.
Min mêrê xwe dît! Baş e ku wî ez nedîme,
Berî ku ew min bibîne, ez ê biçim li jor li hêviya wî bim.

CLÉANTE

Ez, ji bo hinekî wexta xwe derbas bikim, ez ê li vir li benda wî bim,
Ez dixwazim merhebayekê bidimê.

DAMIS

Di derbarê zewaca xwişka min de tiştêkî li guhê wî bixe.
Ez ditirsim ku Tartuffe rê li ber vê yekê jî bigre,
Û bavê min mecbûr bibe ku fikra xwe bitevayî biguhere.
Divê tu zanibî ku ez çendî girîngiyê didim vî karî.
Ku tu dibêjî xwiha min û Valere bi eynî agirê evîne dişewitîn,
Tu dizanî dilê min jî di xwiha vî hevalî de heye;
Û ku pêdivî be...

DORINE

Ew hat.

Sehneya Çaran
(*Orgon, Cléante, Dorine*)

ORGON.

Wey! Merheba birayê min.

CLÉANTE

Min fikir ku ez derketama derve,
û min dît tu vegeyriyayî ez kêfxweş bûm.
Him hîn li der û dorê gul û kulîlk venebûne.

ORGON

Dorinê... Birayê delal, raweste, ez qurbana te me:
Hûn ê îzna min bidin, ku ez bêhna xwe vedim,
Da ku zanibim li vir çi dibe çi diqewime.
Van herdu rojan, her tişt baş derbas bû?
Niha hûn çi dikin? Herkes li ser hal û hemdê xwe ye?

DORINE

Doh na pêr, ji sibê heta êvarî, Sîtî ji ber êşa seyr a serî,
Ji ber agirê canê xwe di nava xwêdanê de gevizî.

ORGON

Û Tartuffe?

DORINE

Tartuffe? Gellekî baş e.
Qelew û xurt e, serçav terûteze, dev û lèvên wî jî sipîsor in.

ORGON

Weyla belengazî!

DORINE

Êvarî, Sîtî pîrî bêmade bû,

Tartuffe

Ji ber êşa serê xwe ya bêderman,
Dema paşivê devê xwe neda pariya nan!

ORGON

Û Tartuffe?

DORINE

Wî paşiva xwe bi tena serê xwe xwar, li pêş çavê wê,
Ne bi min û ne bi te du kew xwarin,
Li gel niv hêta berxê ya qelandî.

ORGON

Weyla belengazî!

DORINE

Ji tarî de hetanî nîveşev
Bêyî ku çavên wê hîstekê herin ser hev;
Ji ber agirê canê wê xew nekete çavê wê,
Heta serê sibê em suhurîn li ber serê wê.

ORGON

Û Tartuffe?

DORINE

Xewa şêrîn dabû serçavên wî,
piştî ji ser sifrê rabû
derbasî oda xwe bû,
Wê gavê xwe xist nav nivîna germ û nerm,
Û bêyî ku xwe tev bide ji êvarî de raket heta dotira rojê

ORGON

Weyla belengazî!

DORINE

Di encamê de, me Sifî razî kir,

Îzin da ku em xwîné jê bigrin,
Bi derbê re rihet bû, êşa canê wê jê çû.

ORGON

Û Tartuffe?

DORINE

Wek pêdivî bû ceger hatê,
Û li hember hemî azaran nefsa xwe bihêz kir,
Ji bo xwîna ku Sityê dabû telafi bike, li taştiya serê sibê
vexwar çar piyalên şerabê.

ORGON

Weyla belengazî!

DORINE

Welhasil herdu jî baş in niha;
Û ez ê herim berî bêjim Sityê
Ku tu çendî eleqedar bûyî pê.

Sehneya Pêncan
(*Orgon, Cléante*)

CLÉANTE

Birayê delal, ew li pêş çavên te henekê xwe bi te dike;
Û ez naxwazim ku tu bi xwe qahr bînî,
Lê ger tu rastiye bixwazî ne neheq e jî.
Tiştê wiha kesî di dinyayê de diye?
Ma dibe ku mirov her tiştî jibîra bike
Û bitenê bi kesekî din eleqedar bibe,
Him jî ji bo yekî bi saya te ji hejariyê rizgar bûye,
Tu xwe dixî rewşeke wiha ku?...

ORGON

Ka raweste hûrayê delal:
Tu nizanî kesê ku tu jê bahs dikî kî ye.

CLÉANTE

Ji bo xatirê te, em ê bêjin ez wî nas nakim;
Lê di encamê de, ji bo ku mirov zanibe çi kes e...

ORGON

Birawo, te ew nas bikira tu yê kêfxweş hûbûya,
Û heye bi heye tu yê heyran û hişmetkarê wî hûya.
Ew mirovekî welê ye... ku, ... ax! Mirovekî... Mirovek e eve.
Her mirovê ku şîretên wî baş guhdarî bike sermest dibe,
Dinya li ber çavên wî dibe toz û dûman, wenda dibe.
Erê, birastî jî gava ez pê re dipeyivim ez diçim dinyayeke din;
Fêrî min dike ku ez qet bi tiştêkî ve neyê m girêdan,
Ruhê min ji her cure dostaniyê dûr dike;
Û ku ez bibînim xwişk û bira, zarok, dayik an jî jina min,
Kî dibe bila bibe, li pêş çavên min bimrin jî
ne li ser guhekî min e.

CLÉANTE

Eve birayê min, ev hisên mirovî nel

ORGON

Ax! Ku te dibûya min ew di çi rewşê de nas kir,
Te yê jî dostaniya ku ez nîşan didim nîşanî wî bidaya.
Her roj dihate dêrê, bi awayekî aram û kemlan,
Tam li pêşberî min rûdinişt li ser herdu çongan,
Bala hemî civatê dikşande ser xwe
Bi eşq û evîna Xwedayî dikir diayên xwe;
Keser dikîşand. Ji ser heşê xwe diçû, mest dibû,
Hergav û niv erd maçîdikir ji Xwedayê xwe re secde dibû
Dema ez derdiketim, bi lez dihate pêşiya min,
Berî bighê m ber derî ava pîroz dida destê min.

Ji xulamê wî, yê ku bi her awayê xwe weke wî ye,
 Fêr bûm ku mirovekî çawa ye û çendî pêdiviya wî heye,
 Ji ber wê min alîkariya wî kir; lê bi awayekî mitewazî
 Wî dixwest li min vegeerêne her rojê beşekî.
 “Ji min re digot, ewende zêde ye, nêviyê tiştê ku tu didî jî
 Ji min re zêde ye; ez ne layiqê vê alîkariya te me”;
 Û gava min nedixwest perê ku min dayiyê ji destê wî bigrim,
 Li pêş çavên min, li hejaran belav dikir.
 Welhasil Xwedê ew şand mala min,
 Ji wê rojê û vir ve tu dibê qey bereket ketiye her tiştê min.
 Ez dibînim ku bi her tiştî eleqedar dibê, heta bigihê jina min
 Eleqeyeke mezin nîşan dide, ji bo bexteweriya min;
 Kesên ku çav berdabinê wê gavê radighêne min,
 Û hesûdiya jê dike heft qat bêtirî min.
 Tu nikarî texmîn bikî bê ev xîretkêşiya wî hete kîjan radê ye:
 Ji tune de xwe tawanbar îlan dike
 Dikare ji bo tiştê vala qiyametê rabike;
 Heta radeya ku dotira rojê dikira xwe tawanbar bike
 Ji ber ku dema dia dike kêçekê digire,
 Û hêrs dibe wê dikuje.

CLÉANTE

Heywax! Birawo, ez dibê qey te heşê xwe berdaye.
 Bi van peyvên xwe, ma tu dixwazî henekê xwe bi min bikî?
 Qesta te ji van henekan hemiyar çi ye?

ORGON

Bûrayê delal, bîhna nexweş ji van peyvên te tê:
 Beleheq nabêjin ‘Kurmê şîrî heta pîrî’;
 Min ji sed caran bêtir ji te re gotibû berî jî,
 Ji ber vî zimanê xwe yê tûj tu yê belayekê bi serê xwe de bînî.

CLÉANTE

Eve peyvên ku ji ser zimanên yên weke we nakevin:
 Dixwazin ku herkes weke wan kor be.
 Li gor we mêranî bêdîn bûne,

Li gor we kesê ku bi pey xeyalên vala nekeve
 Ne rêz û ne jî baweriya wî heye bi tiştên pîroz.
 De here, hemî axavtînen te min biqeyşî serê derziyê natirsînin:
 Ez dizanim ku çi dibêjim, û Xwedê jî bi dilê min zane,
 Em tu carî nabin xulamê van qurretîyên we.
 Wek kesên ku xwe bi derewan mêrxas dihesibînin,
 Kesên ku xwe bi derewan dîndar jî dihesibînin hene;
 Çawa ku qehremanên rasteqîn ne kesên ku qurrefî
 û welwelê dikin,
 Dîndarên rasteqîn ên ku divê mirov li dûv wan here jî,
 Ne qiliçên ku ji hertiştî re lêva xwe hildikin in.
 Hê çi dibe, çi diqewime?
 Ma hûn ferqa di navbera durûtî û dîndariyê de jî nabînin?
 Tu dixwazî ji bo herduyan jî heman tiştî bêjî
 Heman rêzê ji bo rû û maskeya ku wî vedişêre bigrî,
 Durustî û çelaqiyê wekhev bibîni,
 Rastî û nerastiyê tevlihev bikî,
 Qîmet bidî siyê weke kesayetiyê,
 Zêr û zibil bidî ber hev?
 Mirov mehlûqekî seyr û xerîb e!
 Tu carî rastiya xwe qebûl nake;
 Çarçoveya mentiqê wî hertim teng e;
 Qerekerê wî çi dibe bila bibe heddê xwe nizane;
 Û tiştê herî esîl, ji ber sergermiya xwe
 Zêde pê de diçe mahf dike.
 Eve peyvek bû, min ji zavayê xwe re got.

ORGON

Bêşik tu yî zaneyê hêjayî rêzê;
 Tu yî xwediyê hemî zanîna dinyê;
 Tu yî aqilmed û ronakhîrê bitenê,
 Kahîn, û wek Caton mînaka fazîletê ya vê esrê;
 Ku em bi aqilê te bikin hemî xêv in mirovên li ser jêr zemînê.

CLÉANTE

Birayê min, ez ne zanayekî hêjayî rêzê me,
 Û ne jî xwediyê hemî zanîna dinyê me.
 Lê, ez bikurtayî dikarim bêjim ku hemî zanîna min,
 Dîtina ferqa navbera çewtî û rastiye ye.
 Û wek ku ez tu cûre mêrxasiyê
 Ji mominekî rasteqîn bêtir hêjayî rêzê,
 Ji evîna Xwedayî ya xîreta rastî
 Hîn xweşiktir û esiltir nabînim
 Her wiha jî ez tiştêkî
 Ji handaneke derewîn a bincilkirî,
 Ji van sofiyên sexte ku bi bêrêzî
 Û tevgerên xwe yên çelaxane yên li dijî dîn
 Tiştên herî pîroz û ezîz ên mirovî
 Bi awayekî bêperwa îstismar dikin
 Ku bi rastî jî şarlattan in, xirabtir nabînim.
 Mirovên wiha ji bo berjevendiyên xwe
 Bazirganiya dîn dikin bi sofîtiya xwe
 Bi çavkirin, xîretkêşî û helwestên sexte
 Dixwazin mewkî û ihtîbarê peyde bikin ji bo xwe;
 Ev mirov, ez dibêjim, ku bi daxwazeke mezin
 Wek li ser rîya Xwedê bin, ber bi dewelemendiyê ve dibezin;
 Bi îbadet û taetê her roj zêdetir dixwazin
 Lê, ji bo mirov ji zewqên dinyaya fanî dûr bixînin wazan didin;
 Dizanin bixîreta xwe kêmasiyên xwe veşêrin
 Curetkar, kîndar, bêceger, bidek û dolab in;
 Ji bo mirov bixapînin jî, egoîstiya xwe
 Bi bêşermî li paş perdeya dîn vedişêrin:
 Ji ber çavsofî û hiddleta xwe ya bêdawî ewende xeter dibin
 Ku li dijî mirov tiştên pîroz weke çek bikar tînin,
 Û ji ber ku em ihtîrassa wan li wan nagrin, xweş dibînin,
 Dixwazin me bi hesinekî pîrozkirî bikujin.
 Ji ber vî qerekerê xwe yê xapînok pîr dişîbin hev;
 Lê bawermendên jidil bihêsanî cuda dibin ji wan.
 Ez ji birayê xwe re bêjim, sedsala me, nimûneyên hêja

Yên di vî warî de bikêrî me bên, radixe li pêş çavên me
 Li Ariston binêre, li Périandre,
 Oronte, Alcidas, Polydore, Clitandre;
 Bawermendiya van navan kes munaqeşe nake;
 Dilpakî û dilêriya wan qet mezin nake;
 Li cem wan bîhna wê qurretiya ku mirov tehemil nake tune ye,
 Sofîti û bawermendiya wan însanî ye, navendî ye;
 Hertim hal û hereketên mirov rexne nakin;
 Rexneyên welê weke zimandirêjîyê hesab dikin;
 Qurretiyê ji yên wekî din re dihêlin,
 Bi her hal û tevgera xwe qenciya mirov dixwazin.
 Dijîtiya xirabî û nebaşiyê dikin,
 Herkesî sewqî rastî û diristiyê dikin.
 Ne delewêre, ne jî dek û dolab li bal wan peyde nabin;
 Qedr û qîmetê hertiştî zanin,
 Ji herkesî re jiyanekê bextewer dixwazin;
 Li dijî mirovê gunehkar hergîz ne kîndar in;
 Lê ji gunehan bixwe nefret dikin,
 Û ji bo paraztina berjevendiyan Xwedê
 Ji Wî bêtir tucarî nakin cahdê.
 Eve mirovên ku ez dibêjim,
 kesên ku mirov alîkariyê ji wan bixwaze,
 Eve di encamê de nimûneya ku pêşniyaz bibe.
 Mirovê te, tu rastiyê bixwazî, ne kerê ber vî barî ye:
 Tu ji niyeta xwe ya paqij pesnê dîndariya wî didî:
 Lê ez dibêim tu bi sextekariya wî xapiyayî.

ORGON

Bûrayê min ê ezîz, te axavtina xwe temam kir?

CLÉANTE

Erê, tiştê min dixwest bibêjim, bi kurtayî ev bû.

ORGON

Ez di bextê te de me.

(Dixwaze ji wir biçe.)

CLÉANTE

Tikaye, ez dixwazim tişteki din bêjim, birawo.
Ka em mînaqêşeya din bicî bihêlin. Tu dizanî
Ji bo tu keça xwe bidî Valère te soz daye wî?

ORGON

Erê, min soz dayiyê.

CLÉANTE

Ji bo zewaceke welê lirê
We roj jî destnîşanî kiriye.

ORGON

Belê rast e.

CLÉANTE

Wê gavê çima hûn dawetê bi derengî dixin?

ORGON

Ez jî nizanîm.

CLÉANTE

Nexwe nîyeteke te ya din heye?

ORGON

Dibe.

CLÉANTE

Ma tu yê soza xwe bixwî?

ORGON

Ez vê yekê nabêjim.

CLÉANTE

Ez bawerim, tu asteng
Nikare bilbe sedemê ku tu ji soza xwe vejerî.

ORGON

Kes pê nizane.

CLÉANTE

Ji bo gotina peyvekê ma ewende birin û nanîn divê?
Valère ez şandim seredana te, ji te bersivekê dipê.

ORGON

Xwedê kêmaniyê medê!

CLÉANTE

Baş e, lê ez ê çi jê re bêjim?

ORGON

Tu çi dixwazî wê bêje.

CLÉANTE

Lê divê ez fikra te jî zanibim.
Niyeta te çi ye, tu çi dibêjî?

ORGON

Xwedê çi gotibe
Dê here ser peyva wî.

CLÉANTE

Lê divê em ji hev re rastiyê bêjin.
Te sozek daye Valère: tu li ser soza xwe yî?

ORGON

Bi xatirê te!

CLÉANTE

Ez ji bextereşiyekê ditirsim ku bê serê wî,
Di derbarê tiştên bûyî de divê ez şiyar bikim wî.

PERDEYA DUDUYAN

Sehneya Yekê
(*Orgon, Mariane*)

ORGON

Mariane.

MARIANE

Kerem bike bavo.

ORGON

Were ba min, ez ê ji te re tiştêkî bêjim
Bila di navbera min û te de bimîne.

MARIANE

Tu li çi digerî welê?

ORGON

(*Li odeyeke piçûk dinêre*)

Ez dibêm ka hela
Bê kesekî ku dengê me here wan li wir heye an na;
Ji ber ku ev cihê piçûk ji bo mirov di ser de bigrin peyde nabe.
Baş e, niha em xwe bixwe ne.
Mariane, ez te hertim weke keçeke biaqil û henûn dizanim,
Her wiha jî tu pîr li ber dilê min şêrîn î, ez ji te hez dikim.

MARIANE

Ez jî dixwazim layiqî vê hezkirina bavê xwe bim.

ORGON

Mirov dikare ji peyva rast re çi bibêje keça min;
Ji bo vê jî divê tu qet ji gotina bavê xwe dermekevî.

MARIANE

Peyva bavê min rûmeta herî mezin e ji bo min.

ORGON

Pirr baş e. Tu di derbarê mêvanê me Tartuffe de çi difikirî?

MARIANE

Kî, ez?

ORGON

Erê tu. Li bersiva ku tu yê bidî baş bifikire.

MARIANE

Bêgûman! Ez ê bêjim, tu çi bixwazî ez ê bêjim.

ORGON

Ez jî ji keça xwe vê dipê. Wê gavê ji min re bêje, keça min,
Bêje ku ew xwedî kesayetiyeke hêja weke şêr e,
Ku dilê te tê de heye, li her dilê te pirr şêrî e
Û bi daxwaza min tu yê wî ji xwe re bikî weke mêr.
Hî?

(Mariane mat ma. veciniqî)

MARIANE

Hî?

ORGON

Çi bû?

MARIANE

Ez tê negihîştîm?

ORGON

Çi?

MARIANE

Nexwe ez şaş biber ketim?

ORGON

Çawa?

MARIANE

Kî ku te xwest, tu dixwazî ku ez bêjim,
Erê dilê min ketê, ez jê hez dikim
Û bila bibe mêrê min, bavo?

ORGON

Tartuffe.

MARIANE

Ez sond dixwim, bavo, tew ew qet ne li ser bala min jî bû.
Him tu çima min mecbûr dikî ku ez dereweke welê bikim?

ORGON

Lê ez dixwazim ku ev yek birastî bigere;
Biryara min a di vî warî de ji bo te jî têr dike.

MARIANE

Çi? Bavo, tu dixwazî ku?...

ORGON

Erê weke min got, keça min,
Bi zewaca we dê Tartuffe bibe ji malbata min.
Min biryara xwe daye, ew ê bibe mêrê te;
Daxwazên te jî delala min...

Sehneya Duduyan
(*Dortne, Orgon, Mariane*)

ORGON

Tu li wir çî dikî?
Mereqa dilê te ya ku te mecbûr dike
Tu guhdariya me bikî xwiyaye pîrr mezine, diya bavê xwe.

DORINE

Birastî, ez nizamim ev paşgotinî ji ber şîkekê
Yan jî hinekan ji ber xwe ve derxistiye
Lê di derbarê vê zewacê de peyvin hatin guhê min
Û ev yek bi min jî ne karê aqila ye.

ORGON

Çi ye? Xwene ev yek tiştêkî ewende seyr e?

DORINE

Ewende ku,
Mîrza, ez vê yekê ji te jî bawer nakim.

ORGON

Ez dizanim ku ez ê çawa baweriya te pê bînim.

DORINE

Erê, erê, te ji me re ew çîroka seyr ravekir.

ORGON

Hûn ê niha bibînin bê tiştê ku ez dibêjim seyr e yan na.

DORINE

Tu ji xwe re xewnan dibînî?

ORGON

Keça min, ez ji te re dibêjim ez henekan nakim.

DORINE

Na keçê, ji Mîrzayê bavê xwe bawer meke:
Ew henekên xwe dike.

ORGON

Ez ji we re dibêjim...

DORINE

Na, tu beleheq xwe diwestîni,
Tu nikarî baweriya kesî bixwe bîni

ORGON

Welhasil min hêrs meke...

DORINE

De baş e! em bêjin me ji te bawer kir, lê dîsa ji bo te ne baş e.
Tew! Ma dibe, Mîrza, tu mirovekî heşê wî li serê wî
Û xwediyê vê rîha mezin a bihost û niv î,
Divê te heşê xwe berda be ku tiştêkî welê bixwazî?

ORGON

Guhdariya min bike:
Tu zimandirêjyên ji xwe mezintir dikî
Ku qet bi min xweş nayên; min ji te re carekê got, delala min.

DORINE

Ka bêyî ku em bi hev re bixeyidin xeberdin,
Mîrza, ez ricayê ji te dikim.
Ma tu henekê xwe bi xelkê dikî ku tu van zaberatan çê dikî?
Keça te ne layiqê kevneperestekî dera han e:
Berî vê hîn gelek karên din ên ku
Tartuffe divê li wan bifikire hene.
Û paşê, çi hêviya te ji zewaceke wiha heye?
Ji bo çi, tevli hemî dewlemendiya xwe,
Tu zavayekî zigurd layiqî xwe dibênî?...

ORGON

Hiş be. Ger tiştêkî wî tuneye,
 Baş zanibe ku ji ber vê divê mirov qedr û qîmetê bidiyê.
 Hejarî û xizantiya wî ji ber rastî û diristiya wî ye;
 Madem ku wî xwe daye bîr û baweriya Xwedayî
 Gul nade tiştên fanî yên dinyayî
 Di ser her dewlemendiyê re ye, hejariya wî.
 Lê alîkariya min divê karibe rê bide wî
 Ku ji tengasiyê derkeve û li hebûna xwe vegere:
 Ku em van milkan li welêt ji xwedîyan re dikin nîşana esaletê;
 Wê gavê ew jî ji binyata xwe de esilzade ye.

DORINE

Erê lê, ew vê dibêje; û ev beradên wiha,
 Tu rastiye bixwazî bi sofiyekî nakevin, Mîrza.
 Kesê ku bêje ez ê jiyaneke pîroz û bêguneh bijîm
 Divê xwe binav û eslê xwe ewende mezin meke tu carî.
 Jiyana sade ya sofiyê û ev azwerî
 Li hev nakin birastî.
 Ji bo çî ye ev kulbarî û mexrûrî?...
 Ez dibînim ev peyv bi te giran tîn:
 Lê ka em dev ji esaleta wî berdin bîn ser kesayetiya wî.
 Bêyî ku dilê te hinekî jî be biêşî
 Tu dikarî keçeke wek Marianê bidî cîrnexweşekî weke wî
 Ma navê ku tu li derdora xwe binêrî bifikirî
 Û encamên vê zewaca ne lirê ji niha ve bibînî?
 Zanibe ku mirov li dijî daxwaza zewaca keçekê bê
 Ar û namûs dikeve xeterê.
 Bîryardariya jiyaneke binamûs û ar a jinê
 Dimîne li ser meziyetên mêrê ku tu wê didiyê.
 Mêrê ku ji ber jinê serî berjêr e
 Herkes dizane ku ew nemêr û bêkêr e.
 Bi kesên welê nemêr û bêkêr re
 Sedeqet û dilsozî gellekî zor e;
 Kî ku keça xwe bide mêrekî ku jê nefret bike

Li ba Xwedê ew herpirsiyar e ji gunehên ku keç dike.
Divê tu baş bifikirî ku biryareke wiha çendî girîng û xeter e.

ORGON

Tu yê nîşanî min bidî ku ez ê çawa bijîm, keçê?

DORINE

Ji dêvla ku tu peyvên wiha bikî tu guhdariya min bikî hîn çêtir e.

ORGON

Em bi van çîrokan serê hevdu beleheq nêşênin, Mariane:
Ez di zanîm kî tayê te ye, ez havê te me, qenciya te dixwazim.
Tu rastiye bixwazî min ji bo te soz dabû Valère jî;
Lê ji xeynî ku bi qumarê dilîze dibêjin her qumar bûye karê wî,
Her wiha jî ez jê bişik im ku mirovekî hinekî bêdîn e:
Li dêran qet çavê min pê neketiye.

DORINE

Tu dixwazî ku ew jî weke hinekan saeta ku tu tê,
Ji bo li ber çavên te xwe şêrîn bike bazde bê?

ORGON

Kesî li fikra te ya di vî warî de nepirsî.
Welhasil yê din herî qencê Xwedê yê li rûyê dinyê ye,
Û ev jî dewlemendiyeke ku nabe nesîbê herkesî.
Ev zewac dê hemî daxwaz û awatên te bêne çih,
Dê te di nav zewq û xweşiyê de bihêle.
Hûn ê bi hev re bixêr û xweşî, bi dilsozî
Weke du zarok, du qumriyan bextewer bijî;
Dê di nav we de qet çênebe nexweşî û qiriktahlî,
Û hemî tiştên ku tu bixwazî tu yê pê bikî.

DORINE

Ew? Bawer bikin ew ê wî bixapîne.

ORGON

Ev çi bû îja! Ev çawa peyvin tu dikî!

DORINE

Ez ji te re dibêjim meyla wî,
Ku çavê xwe ji xapandinê re bigre heye, Mîrza, hemî
Rûmet û dawpaqîjiya keça te nikare rê bigre
li her vê daxwaza wî.

ORGON

Hergav û niv peyva min mebirre, bi zimanê xwe karibe û hiş be,
Ma bêyî ku tu difna xwe bixî her tiştî
karekî din ê ku tu bikî tune?

DORINE

Ez ji bo çêyî û qenciya te dibêjim, Mîrza.
*(Dorine her gava ku Orgon dixwaze vegere
ji keça xwe xeberde peyva wî dibirre.)*

ORGON

Ewende xîretkêşî jî zêde ye: Tika ye hiş be.

DORINE

Ku min ji te hez nekira...

ORGON

Ez naxwazim ku kes ji min hez bike.

DORINE

Tu bixwazî nexwazî, ez ê ji te hez bikim, Mîrza.

ORGON

Hella hella!

DORINE

Şeref û rûmeta te ji bo min di ser her tiştî re ye,

û ez tehemil nakim
Ku xelk rabin û rûnin henekê xwe bi yekî wek te bikin.

ORGON

Qe tu niha hiş nabî?

DORINE

Wijdanê min qebûl nake
Ku mirov bihêle tu rê bidî zewaceke wiha

ORGON

Tu dev ji van zimandirêjîyên xwe bernadî, hiş nabî, koremarê...?

DORINE

Wî porkurê! Mirov sofî be û ewende bihêrs û kîn be?

ORGON

Erê, li hemberî lewçetiyên wiha mirov hêrs dibe,
Êdî ez dixwazim ku tu devê xwe bigrî hiş bibî.

DORINE

Bila wek te be. Lê, ku tu nehêlî ez bipeyivim
Xwene tu nikarî nehêlî ku ez bifikirim jî.

ORGON

Ku tu dixwazî bifikire; lê fikrên xwe ji xwe re bihêle
Ji min re tiştêkî mehêje, nexwe... tu ji destê min xelas nabî. Bes e.
(Vedigere ser keça xwe.)
Ez bi awayekî herfireh,
Li hertiştî bi kitekit fikirîm.

DORINE

Ez dikim har û dîn bibim
Ji ber ku nikarim bipeyivim.
(Dema Orgon berê xwe didiyê hiş dibe.)

ORGON

Herçend ne xortekî pîrî bedew be jî,
Tartuffe mirovekî wiha ye...

DORINE

Erê, birastî jî çi mirovekî kirêt e.

ORGON

Ku sempatiya mirov li hemberî
Hemî jêhatîbûna mirovên din tunebe jî...
(Li jinikê zîvirî û destên wî di bin çengên wî de lê nêrî.)

DORINE

Eve çi qismetekî baş!
Ku ez li şûna wê bûma,
Bêzîrar kesî nikaribû ez ji xwe re bizorê bibirama;
Wê gavê piştî dawetê min ê nîşanî wî bidana
Ku tola jinekê hergav hazir di bin çengê wê de ye.

ORGON

Diyar e kes guhdariya tiştê ku ez dibêjim nake?

DORINE

Tu giliyê çi dikî? Ez bi te re xeber nadim.

ORGON

Ku tu bi min re napeyivî karê te li vir çi ye?

DORINE

Ez ji xwe re xwe bixwe dipeyivim.

ORGON

Pîrî baş e. Ji bo ku ez cezayê vê zimandirêjiya te bidim,
Divê ku ez sîlleheke wiha baş li te bixim.
(Xwe xweş dike ku sîllehekê lê bixe;

û her ku ew awiran jê dide,
Dorine ne xwe tevdide ne jî dipeyive.)
 Keça min, divê tu jî vê daxwaza min qebûl bikî...
 Bawer bike mêrê ku... min ji te re hilbijartiyê...
 Ka dîsa bi xwe re bipeyive?

DORINE

Tiştêkî ku ez jî xwe re bêjim nema.

ORGON

Peyveke bitenê jî.

DORINE

Ez nema dixwazim bêjim.

ORGON

Helbet, ez jî te diceribînim.

DORINE

Ez ne gêj im, ez jî dizanim!

ORGON

Kurt kurmancî, keça min, divê tu qedrê min zanibî,
 Û rêza biryara ku min daye bigrî.

DORINE

(Ji wîr direve û dibêje)
 Ez bûma, min ê têr henekê xwe pê bikira
 û ez bi mêrekî wiha re nedizewicîm.
(Orgon dixwaze sillehekê lê bixe, lê destê wî li valahiyê dere.)

ORGON

Keça min, ev çi ye bûye bela serê me,
 Ev dê rojekê serê me têxe belayê.
 Min ê niha çi bigota min ew jî jibîra kir:

Wê bi zimandirêjyên xwe xwîn weravte nava min,
Ez ê derkevîm derve, bîhna xwe vedim
da ku hinekî heşê min bê serê min.

Sehneya Sisiyan
(*Dorine, Mariane*)

DORINE

Tu ji min re nabêjî, qey devê te hatiye girêdan,
Ma ez ê hertim ji dêvla te ve bipeyivim?
Bêyî ku tu ihtiraza tiştêkî piçûk jî bikî,
Tu çawa zewaceke welê bêmane qebûl dikî!

MARIANE

Li hemberî havekî zorker tu dixwazî ez çi bikim?

DORINE

Li hember xetereke wiha çi divê wê bike.

MARIANE

Baş e, lê çawa?

DORINE

Jê re bêje ku ji bo xatirê hinekan mirov nikare ji kesekî hez bike,
Divê ku tu ji bo xwe bizewicî, ne ji bo xatirê wî,
Ji ber ku hexteweriya te mewzûbahse,
Divê zave bidilê te be, ne ku bidilê wî,
Û ku Tartuffê wî welê pê şêrîn û xweş e,
Bila ew biçe pê re bizewice.

MARIANE

Ger tu rastiyê bixwazî, li hemberî havekî ewende xedar,
Taçeta min tunebû ku ez du peyvan bênim ser hev tucar.

DORINE

Lê divê em tişteki bikin.
Valère ji bo bi te re bizewice hin gavan tavêje;
Tu jê hez dikî yan nakî, ez ketim bextê te ji min re rast bêje?

MARIANE

Ax! di derbarê evîna min de çendî tu li min neheqî,
Dorine! ya ku vê pirsê ji min dike tu yî?
Ma min ji sed carî bêtir dilê xwe ji te re venekir
Û ma qey tu nizanî dilê min çendî dişewite ji bo wî?

DORINE

Ez çî zanim gello dil û devê te yek bû,
Û birastî jî dilê te di wî yarî de hebû?

MARIANE

Dorine, tu bi van şikên xwe, neheqiyêke mezin li min dikî
Hîsên min ên rasteqîn ji herkesî bêtir tu dizanî.

DORINE

Welhasil tu jê hez dikî vê gavê?

MARIANE

Erê, him jî bihezkirineke mezin.

DORINE

Û biqendî ku xwiya ye ew jî ji te hez dike hemin?

MARIANE

Ez welê bawer dikim.

DORINE

Û hûn herdu jî
Ji bo rojekê berî bizewicin dişewitin weke hev?

MARIANE

Helbet.

DORINE

Wê gavê mesela zewaca bi Tartuffe re hûn ê çawa çareser bikin?

MARIANE

Ez ê xwe bikujim, ku zorê li min bikin.

DORINE

Tew! ev yek qet nehatibû bîra min;
Ji bo tu jê xelas bibî jixwe ji mirinê pê ve tuneke rîyeke din;
Bêgûman derman peyde nabe. Gava peyvên welê tên guhê min
Ez dîn û har dibim, heşê min diçe ji serê min.

MARIANE

Ji bo Xwedê! Dorine, tu çendî bêwijdanî!
Çi bi serê kê de bê qet ne xema te ye.

DORINE

Kesên ku gotinên elatewş bêjin ne li ser guhê min in
Hela yên ku di rewşeke wek ya te de dibêrxwe nedin.

MARIANE

Tu dixwazî ku ez çi bikim? bi vê şermezariya xwe.

DORINE

Lê ji evîna di dil de re mêrxasî û egîfî divê.

MARIANE

Ma min eşqa xwe ya ji bo Valère bi mêranî eşkere nekir?
Îzna bavê xwe, ma tu dibê divê wê jî ez bistînim?

DORINE

Wekî din çi? Ger ku bavê te serhişkekî bêhempa ye,

Ku ji Tartufê wî pê ve çavê wî tiştêkî din nabêne
 û li ser peyva xwe nesekiniye soza xwe xwariye,
 Ma divê em gunehê vê jî têxin situyê evîndarê te?

MARIANE

Baş e gello divê ez bineyînî bersiveke hişk bidim
 û nerazîbûna xwe diyar bikim,
 Dilê xwe yê birîndar û evîndar li ber herkesî vekim?
 Ew çendî ji bo min hêja, biqîmet û rûmet be,
 Ma divê ji bo wî ez dev ji havê xwe
 û rûmeta keçaniya xwe berdim?
 Tu dixwazî ku evîna min bi ser zar û zimanê xelk û alemê keve?

DORINE

Na, na, qet tiştêkî welê naxwazim. Ez dibînim ku dilê te
 Di Mîrza Tartuffe de heye; û dema ez didim dîna xwe,
 Ez dibêjim ez neheq im ku te vegeînim ji oxura te.
 Çi heqê min heye ku ez nehêlim pêk bèn mebest û miraclên te?
 Fersendeke welê mezin hergav nakeve destê te.
 Mîrza Tartuffe ho! ho! û ne tiştêkî din ku em pêşniyaz bikin?
 Bêşik Mîrza Tartuffe, divê em baş bifikirin,
 Na, ne mirovekî ku em hesabê wî nekin,
 Ku mirov bilê hevalê jiyana wî jî ne tiştêkî hindik e.
 Herkes wî ji niha ve dibê ber perrê ezmanan, mezin dike;
 Belbî esîlzade bû li welatê xwe, lihevhatiye jî bi kesayetiya xwe;
 Guhên wî sor in, mewîja reş di qirika wî re xwiya ye:
 Tu yê pîrr bextewer bibî bi mêrekî weke wî.

MARIANE

Ji bo Xwedê!...

DORINE

Dema tu bibînî ku tu bûyî jina mêrekî welê bedew
 Ji kêfan per û bazkên te dê çêbibin tu yê bibî mêkew

MARIANE

Haho! bişemirêne, ez di bextê te de me,
tu yê van peyvan ji min re mekî,
Ji bo em rê li ber vê zewacê bigrin divê tu alîkariya min bikî,
Ez tê gihîştim, xebera te ye, û ez amade me weke te bikim ku tu
çi jî bêjî.

DORINE

Na nabe, divê keçek herî qîmetê bavê xwe bigre,
Heta dixwaze bila meymûnekê jî jê re bike mêr.
Bextê te pir vekiriyê: ji bo çi tu dilê xwe bixwe dişewitênî?
Tu yê li erebeyekê siwar bi hî biçî bajarê wî yê piçûk,
Ku mam, pismam, dotmam û xizmên wî lê bûbin çirrik,
Û tu yê bi wan re ji sibê heta êvarî sohbetê bikî
Pêşî wê te bi malmezinên wir re bidin naskirin;
Paşê tu yê biçî serecanê, ji bo bixêrhatina xwe,
Cem Sîfî û Xanimên malmezin ên bijartî
Ew ê jî kursiyêke piçûk nîşanî te bidin û rûmetê bidin te.
Li wir, li karnavalê, tu dikarî guhdariya zirneyan bikî,
Carinan jî li meymûn û kûkleyan binêrî
Û xwe li baloyekê ferz bikî;
Tevlî her tiştî jî ger mêrê te...

MARIANE

Ax! tu yê min dîn bikî.
Ji van peyvên vala bêtir divê tu şîretan li min bikî.

DORINE

Ji heddê min û bavê min zêde ye, ez qewraşa te me.

MARIANE

Ûy! Dorine, tu bi qedrê Xwedê kî...

DORINE

Ji bo cezakirina te divê ev yek welê be.

MARIANE

Dorine, delala min!

DORINE

Na, nabe.

MARIANE

Ku ez niyeta xwe vekirî bêjim...

DORINE

Çare tuneze: Tartuffe qismetê te ye, divê tu bi qismetê xwe razî bî.

MARIANE

Tu dizanî ku hertim bawerîya min bi te tê:

Qencyekê bi min bike...

DORINE

Na, bi ya min! tu yê jî wek wî bibî qilîç.

MARIANE

Hema welê! madem aqîbeta min te eleqedar nake,

Min bi derd û kulên min re bitenê bihêle:

Dê dilê min hêz û taqeta xwe ji vê bistêne,

Ez dizanim ku ez ê xwe çawa ji van derd û kulan xelas bikim.

(Dixwaze ji wir biçe)

DORINE

Hê! hela raweste, were vira. Hêrsa min çû, kela min sar bû.

Ez çî bikim, tevî hemî tiştî, divê dilê mirov bi te bişewite.

MARIANE

Li min binêre, ku min duçarî vî derdê bêderman bikin,

Min ji te re got, Dorine, ez bimrim çêtir e ji bo min.

DORINE

Êdî qet xeman mexwe. Em ê karibin bihosteyî

Derkevin ji bin vî barî... Lê eve Valère, yarê te.

Senneya Çaran
(*Valère, Mariane, Dorine*)

VALÈRE

Li ser zar û zimanê herkesî, Sitî, xeberek heye,
Ez nizamim çî dibe, lê bêguman dê nexerab be

MARIANE

Çî bûye?

VALÈRE

Dibêjin ku tu yê bi Tartuffe re bizewicî.

MARIANE

Bavê min
Tiştêkî welê birastî jî xistiye serê xwe.

VALÈRE

Bavê te, Sitî...

MARIANE

Erê fikra xwe guhert:
Ev tişt wî bixwe ji min re jî got.

VALÈRE

Çî? Tu jî dil dibêjî?

MARIANE

Erê, jî dil dibêjim.
Ji min re vekirî fikra xwe got ku zewaceke wiha dixwaze.

VALÈRE

Baş e fikra te çî ye,
dikarim fêr bibim
Sitî?

MARIANE

Ez çî zanim.

VALÈRE

Çi bersiveke dirist.
Tu wiha nizanî?

MARIANE

Nexêr.

VALÈRE

Nexêr?

MARIANE

Tu şîretekê li min nakî?

VALÈRE

Madem wiha ye, ez dibêm, hema here wî metehî bike.

MARIANE

Tu vê şîretê li min dikî?

VALÈRE

Erê.

MARIANE

Tu birast dibêjî?

VALÈRE

Qet şik tune ye:

Tercîha bavê te di cihê xwe de ye, û ya baş ew e ku tu guhdariya
wî bikî.

MARIANE

Him baş e! Ev şîreteke ku divê bi guhê min ve bibe guhar, Mîrza.

VALÈRE

Ji bo ku tu wê pêk bînî, ez dibêm qey tu yê zehmetiyê qet
nekşînî.

MARIANE

Ez ê ji zehmetiya dema ku te ev şîret li min kir bêtir nekşînim.

VALÈRE

Min ev şîret ji bo dilê te xweş bikim li te kir, Sitî.

MARIANE

Ez ê jî ji bo te memnûn bikim wê pêk bênim.

DORINE

Em ê bibênin bê hînê dawîya vî karî dê bigihê ku.

VALÈRE

Aya hezkirina ku tu dibêjî ev e?

Tu çima nabêjî hemî vir û derew e. Tu ya ku...

MARIANE

Ez ricayê ji te dikim, êdî em careke din bahsa vê yekê nekin.

Te ji min re bi awayekî vekirî got, ku divê ez mirovê ku weke mêr ji min re tê pêşniyaz kirin qebûl bikim:

Madem te ev şîret ji bo silametiya min li min kir,

Ez jî soz didim te, ku ez ê vê şîreta te bicîh bînim.

VALÈRE

Ji bo qebeheta xwe veşêrî gunehê xwe mexe situyê min.

Jixwe te biryara xwe bêrê dabû;

Niha jî ji bo ji soza xwe veşêrî

Tu li mahneyeke peritî digerî.

MARIANE

Birastî jî wiha ye, tu rast dibêjî.

VALÈRE

Bêşik wiha ye; û dilê te

Tucarî bi awayekî rastî ji bo min ne şewitî.

MARIANE

Mixabin! heqê te heye tu wiha bifikirî.

VALÈRE

Erê, erê, heqê min heye; lê ji ber dilê min ê şikestî
Ez ê miradê xwe berî te pêk bînim belbî;
Ez dizanim, ku ez ê çavê xwe li kê bigerînim
û destê xwe bavêjim ku.

MARIANE

Ax! qet şika min jê tune; mirovekî wek te xwedî meziyet
Dê balê bikşîne ser xwe helbet...

VALÈRE

Tu xwedê, ka em meziyetê li wir bihêlin:
Bêgûman, ji helwesta te jî xwiyaye,
ku ez ne mirovekî pîr bimeziyet im.
Lê hêviya min heye ku dê jineke din ji te çêtir li min binêre,
Gava min dev ji te berda û bitenê mam,
Ez dizanim ku dê kî lixwe dîne
û tiştê min wenda kir li min vegefîne.

MARIANE

Tiştê tu wenda bikî ne ewende giran e; û tu yê pîr bihêsanî
Diber dilê xwe bidî tiştê çûyî jibîra bikî.

VALÈRE

Tiştê ji destê min bê ez ê bikim, divê tu ji min bawer bikî.
Dema kesek mirov jibîr dike li mirov jî dibe rik;
Tiştê ji destê mirov jî tê mirov bêkêmanî dike:
Ku mirov di karekî de biser nekeve,
bikêmanî divê mirov wek biserketibe bike;
Dema mirov hîn jî ji kesa ku terka mirov kiriye hez bike,
Bêrûmetî û serberjêrî ye, tu carî nayê efûkirin.

MARIANE

Ev his, bêgûman, esil û berz in.

VALÈRE

Helbet; him jî divê ji alî herkesî ve wiha bên zanîn.
Yanî çi? Ma tu dixwazî ku heta roja sikiratê
Ez agirê evîna te di nav û dilê xwe de veşêrim,
Û tevî ku tu ji min hez nakî ez jî ji kesekî hez nekim,
Te di mil û himêza xelkê de bibînim û li te binêrîm?

MARIANE

Berevajîya vê: ku tu ji min dipirsî, tiştê ku ez jî ji te re dixwazim
ev e;

Û min dixwest ku ev daxwaza min rojek berî rojê pêk were.

VALÈRE

Birastî jî te dixwest?

MARIANE

Erê.

VALÈRE

Ewende heqaret bes e, Xanim;
Û eve ez diçim ku daxwaza te pêk bînim.
(Ji bo ji wir biçe gavekê davê û dîsa vedigere)

MARIANE

Tu yê pîr baş bikî.

VALÈRE

Qet nebe jibîr meke ku te bixwe
Ji bo vê fedekariya mezin ez dahf dam.

MARIANE

Bila be.

VALÈRE

Û ku ya ev rê biber min xist
Ji te pê ve tir ne kesî din bû.

MARIANE

Min rê biber te xist, bila wilha be.

VALÈRE

Bes e: dê daxwaza te wê gavê pêk bê.

MARIANE

Pirr baş e.

VALÈRE

Heta ez hebim, tu min careke din nebînî.

MARIANE

Hela çê.

VALÈRE

(Diçe, û, gava dighê ber derî, li xwe vedigere)

Uhu?

MARIANE

Te tiştekek got?

VALÈRE

Te gazî min nekir?

MARIANE

Gazîkirina çi? Tu ji xwe re xewnan dibênî.

VALÈRE

De bila wek te be, ez ê jî bi riya xwe de herim wê gavê.
Bixatirê te, Sifî.

MARIANE

Oxur be, Mîrza.

DORINE

Ku hûn ji min bipirsin,
Ji ber van peyvên elatewş, ez dibêm qey we heşê xwe berdaye:
Û bêyî ku ez dengê xwe bikim ji mêj ve li şerê we dinêrim,
Da ku bibînim bê hûn dighên çi encamê.
Hey lo! Valère beg.
*(Diçe bi millê wî digre wî disekinîne, û ew jî
wek birast dibexwebide xwe vedigijgijîne)*

VALÈRE

Hi! tu çi dixwazî, Dorinê?

DORINE

Were vira.

VALÈRE

Na, nabe, ez bi hêrsa xwe nikarim.
Kes nikare min vegerine, wê çawa xwestiye ez ê wiha bikim.

DORINE

Raweste.

VALÈRE

Na, tu nabînî? ev mesele ji bo min xelas bû çû.

DORINE

Hema wiha!

MARIANE

Ew naxwaze min bibêne, ji bo ku çavê wî bi min mekeve dere,
Ya baş ew e ku ez herim, bila ew bikêfa xwe bimîne.

DORINE

(Dev ji Valerî berdide bazdide ku Marianê bigire.)

Îja dora te ye. Tu bi ku de dibezi?

MARIANE

Min berde.

DORINE

Divê tu vegefi.

MARIANE

Na, nabe, Dorine; tu beleheq min didî sekinandin.

VALÈRE

Ez ne zarok im, ez dibênim ku ew ji hebûna min aciz e.

Helbet divê ku ez herim da ku bîhna wê fireh bibe.

DORINE

(Dev ji Marianê berdide bazdide ku Valerî bigire.)

Dîsa tu? Ku ez jî bihêlim hûn biçin bila Xwedê bela min bide!

Dev ji van nazan berdîn, û herdu jî werin vir.

(Herduyan jî ber bi xwe de dikşîne.)

VALÈRE

Baş e, lê niyeta te çi ye?

MARIANE

Tu dixwazi çi bikî?

DORINE

Ez dixwazim we bighînim hev, û vê meselê hal bikim.

Ma hûn dîn in, çima hûn welê şerê hevdu dikin?

VALÈRE

Ma dengê wê nehate te ku çawa bi min re dipeyive?

DORINE

Ma tu dîn bûyî, Sitî, tu çima ewende hêrs dibî?

MARIANE

Ma te nedî ku çî dike, û çawa neheqiyê li min dike?

DORINE

Hûn herdu jî tiştên betîbetal dibêjin.

Sitî jî te pê ve ji kesekî din hez nake, ez şahid im.

Mîrza Valère jî ji te pê ve ji kesî din hez nake, û bitenê dixwaze

Ku tu je re bibî bermalî; ez xêrê ji ciwaniya xwe nebênim.

MARIANE

Wê gavê çima tembiyeke wiha li min kir?

VALÈRE

Baş e çima wê di derbarê vê meselê de tişteki wiha ji min xwest?

DORINE

Hûn herdu jî xurifi ne. Ka herdu jî destê xwe bidin min.

Heydê, tu jî.

VALÈRE

(Destê xwe dide Dorinê.)

Dibêjin destê bitenê deng jê nayê, destê min bitenê dê bibe çî?

DORINE

Wî! heydê, tu jî yê xwe bide.

MARIANE

(Ew jî destê xwe dirêj dike.)

Tu nabê dê yê min bibe çî?

DORINE

Hela, hela! zû, ber bi min de werin.

Hûn bixwe nizanin ku hûn çendî jî hev hez dikin.

VALÈRE

Balê ku tu naxwazî qet zorê mede xwe,

Û hinekî bêkîn û nefret li mirov binêre.
(Marianê ters ters li Valerî nêrî û di ber xwe de bişîrî.)

DORINE

Hûn rastiye bixwazin, evîndar hemî sewesî dibin.

VALÈRE

Niha, ma mafê min tuneye ku ez giliyê te bikim?
 Û ku tu rastiye bixwazî, ma ev ne neheqî ye ku sirf ji bo kêfê
 Tiştê ku tu zanî ez jê hez nakim tu ji min re bi rik dibê?

MARIANE

Lê tu, tu ne mêrê herî nankorî...?

DORINE

De ka em vê minaqeşa bêwext bicîh bihêlin, û em bifikirin
 Bê em ê çawa karibin rê li ber zewaca bi Tartuffe re bigrin.

MARIANE

Ka tu ji me re bêje divê em çî ray û tevdiran bigirin.

DORINE

Di vî warî de çî ji destê me bê bêfîkar em ê bikin.
 Bavê te tim dê henekên xwe bi me bike,
 lê xem nake ew jî çîrokan dibêje;
 Baştir e ku hûn di rewşeke wiha xeter de
 Weke ku biryara wî qebûl dikin hereket bikin,
 Di rewşeke wiha awarte de divê ew bi we bawer be
 Ji bo çareserkirina pirsên wiha gava wext hebe
 Her tişt bihêsanî û hêminî çareser dibe.
 Carinan tu yê xwe ji nişka ve li nexweşî dênî,
 Û ji bo dawetê mohletê bixwazî;
 Carinan wexta tu ûtiyê dikî tu yê tişteki bişewitênî:
 Mirêkekê bişkênî, tu yê di xewna xwe de ava şêlû bibênî,
 Û tu yê vê yekê wek sebebê mirinekê şirove bikî.
 Di encamê de, ew ê tê bigihê ku tu ji Valerî pê ve kesî naxwazî

Û ji kesî re nabêjî 'erê' li hizûra metranî.

Lê bi raya min, ji bo em karibin baş biser kevin, baştir e
Ku kesek we nebêne da ku li vir hûn bi hev re dipeyivin.

(Vedigere ser Valêrî)

Tu here, û berî ku tu dereng bimînî tembiyê bide hevalên xwe,
Da ku wî îqna bikin ku soza daye te bêne cîh.

Em ê jî biçin birayê Sityê şiyar bikin ku alikariya me bike,

Û dêmaryê jî bikşînin aliyê xwe.

Heydê oxur be.

VALÈRE

(Ji Marianê re dibje)

Kar û xîretkêşiya ku em ê bikin çî dibe bila bibe,

Tu rastiye bixwazî, hêviya min a herî mezin dîsa tu yî.

MARIANE

(Ji Valêrî re dibje)

Ez mesûliyeta daxwaza bavê xwe nagrim ser xwe;

Lê ez ê bêjim ku ez ji Valêrî pê ve ji kesî din re nabim yar.

VALÈRE

Çendî te dilê min rihet û hînik kir!

Ku bavê te karibe ceger bike jî...

DORINE

Ax! Ev evîndar jî tu carî ji lewçetiyê têr nabin.

Ez ji te re dibêjim biçe.

VALÈRE

(Gavekê davêje û dîsa vedigere)

Di encamê del...

DORINE

Mirovê te jî çendî lewçe ye!

(Bi millê her yekî ji wan digre û dahf dide.)

Tu di vî alî re here; û tu jî, di aliyê din re.

PERDEYA SISIYAN

Sehneya Yekê
(*Damis, Dorine*)

DAMIS

Bila Xwedê aniha bela min bide,
Û herkes ji min re bêje serseriyekî dera han bû,
Ku ez, tiştê min xistiye serê xwe nekim,
Û li ber qudretêkê an jî ji ber hirmetekê sêrê xwe dênim!

DORINE

Ji bo xatirê Xwedê hinekî hêmin be, rihet rûnê:
Peyvek bû bavê te ji xwe re gotiye.
Mirov hertiştê ku tê aqilan wê gavê nake,
Riya ji fikrê heta pêkanîne gellekî dûr û dirêj e.

DAMIS

Divê ez nehêlim ku ev bêrûmet rezaletêke din derxe,
Ez ê bitenê du peyvan di guhê wî de bêjim.

DORINE

Ha! bisebir be! Him li hemberî wî, him li hemberî bavê xwe,
Bihêle bila dêmariya te tiştê bikeve ser millê wê bike.
Tesîra wê gellekî li ser wî heye;
Ew çî bêje Tartuffe nikare ji peyva wê derkeve,
Dibe ku ew bixwaze dilê wê xweş bike.

Ez ji Xwedê dixwazim ku welê be! ev dê karê me hêsantir bike.
Welhasil sirf ji bo xatirê te ew dixwaze wî bibîne;
Di derbarê vê zewaca ku te pîrr aciz dike de,
dixwaze fikra wî hîn bibe,
Hisên wî zanibe. û pê bide fêmkirin
Ku ew tiştekî wiha bike û menfaetekê ji vî karî bipê
Dê bibe sebebê çendî şer û pevçûnan.
Xulamê wî got ku ew dia dike, û ji ber vê nikaribûye wî bibêne;
Lê dîsa wî xulamî ji min re got ku ew dike dakeve xwarê.
Tu here, ez ricayê ji te dikim,
min bitenê bihêle ku ez li bendê bim.

DAMIS

Di dema vê hevclîtinê de ez jî karim li vir bim.

DORINE

Nabe. Divê ew bitenê bi hev re bipeyivin.

DAMIS

Ez ê jê re tiştekî nebêjim.

DORINE

Tu henekê xwe dikî: ez dizanim tu çendî xwîn germ î,
Û ev jî têr dike ku karê me nêvcî bimîne, neçe serî.
Divê tu biçî.

DAMIS

Na: hêyî ku ez hêrs bibim ez dixwazim bitenê li wan binêrim.

DORINE

Tu çi mirovekî ser hişk î! Waye tê. Heydê biçe.

Sehneya Duduyan
(*Tartuffe, Laurent, Dorine*)

TARTUFFE

(*Gava Dorinê dibîne dibêje*)

Laurent, qamçiyê min li ser kirasê min ê ezêb baş bişidêne,
Û dia bike ku Xwedê tu carî nûra xwe ji ser te kêm neke.
Ku kesek bixwaze min bibêne, ez diçim seredana hefsiyar
Da ku wek sedeqe peran li wan belav bikim.

DORINE

Mala virrekan bişewite!

TARTUFFE

Tu çi dibêjî?

DORINE

Ez dibêjim ku...

TARTUFFE

(*Ji berîka xwe destmalekê derdixe.*)

Tu Xwedê! ez ricayê ji te dikim,
Berî ku tu xeberdî vê destmalê ji destê min bigre.

DORINE

Ji bo çi?

TARTUFFE

Wê sînga xwe ya vekirî bigre bila çavê min pê mekeve:
Tiştê wiha mirov ji îmanê derdixin,
Û dikarin mirov ji rê bibin.

DORINE

Tu ji xwe re li mahnakê digerî ku tu ji rê derkevî,

Xwiyaye li hemberî canê tazî tu bi xwe nikarî?
Ez nizamim çima tu ewende biheyecan î:
Ez bûma ewçend heyecanê min nedigirt,
Ku min tu bidîta çîpîtazi jî,
Tu bi qendî serê derziyê tesîrê li min nakî.

TARTUFFE

Heşê xwe bide serê xwe xweşik bipeyive,
Yan na ez diçim bi min re wiha neaxive.

DORINE

Na, na, ji bo ku tu ji min xelas bî ez ê biçim,
Lê bitenê du peyvên min hene ez ê ji te re bêjim.
Sîfî dike bê aliyê xulam û xizmetkaran,
Gotineke wê heye dixwaze ji te re bibêje.

TARTUFFE

Heyhat! Ser ser û çavê min.

DORINE

(Di ber xwe de dibêje.)

Çawa nerm bû!

Lê çi dibe bila bibe, ez dizanim ku ez ê çi bînim serê wî.

TARTUFFE

Ew ê zû bê?

DORINE

Ez dibêm qey pêjna wê ye tê.

Erê, ew bixwe ye, divê ez we bitenê bihêlim.

Sehneya Sisiyan
(*Elmire, Tartuffe*)

TARTUFFE

Qencî û xweşiya Xwedê heta bihete ligel te be
Xêr û xweşî her di ruh û bedena te de be,
Û biqendî ku ez wek yekî ji herî feqîrên Xwedê
Ku ji evîna wî îlhamê distînin dixwazim bereket di emrê te de be.

ELMIRE

Ez gellekî minetdarê van diayên te yên sidqane me.
Lê ka em rûnên, ji bo ku hîn rihet bipeyivin.

TARTUFFE

Siheta te çawa ye, tu baş bûyî?

ELMIRE

Ez pirr baş im. Mala Xwedê ava germiya canê min zû çû.

TARTUFFE

Diayên min ewende ne meqbûl in
Ku hêjayî qenciya Xwedayê jorîn bin;
Lê min ji Xwedayê xwe tu diayeke ji dil
Ku tê de siheta te ne mewzûbahs be nedikir.

ELMIRE

Tu pirrî liber min ketiyî.

TARTUFFE

Mirov çendî qîmet bide siheta te dîsa têr nake,
Û ji bo siheta te ku ez ya xwe feda bikim jî xem nake.

ELMIRE

Ev tevgera te şifqeta xiristiyaniyê baş derdixe pêş,
Ez ê çawa ji bin vê qenciya te derkevim ji min re bibêje.

TARTUFFE

Ez ji bo xatirê çavên te çi bikim têr nake.

ELMIRE

Ez dixwazim di derbarê karekî nehînî de bi te re bipeyivim,
Baş e ku dora me jî xalî ye, kesekî ku me guhdarî bike tuneye.

TARTUFFE

Ez jî ji vê yekê memnûn im, û bêgûman
Bi min jî xweş e, Sitî, ku ez û te bitenê man:
Min ji Xwedê fersendeke wiha dixwest,
Qey heta vê saetê bû qismet, hate dest.

ELMIRE

Ji bo min, tiştê ku ez dixwazim, peyva kurt kurmancî,
Tu yê dilê xwe ji min re vekî û tiştêkî ji min veneşêrî.

TARTUFFE

Ji bo min jî, vekirina dilê min ji yeke weke te re
Bextewerîya herî mezin û bitenê ye,
Û ez ji te re sond dixwim ku tiştên min
Ji bo kesên dixwazin bedewiya te bibînin tên û diçin gotin
Hin weke paşgotinî diguhêzin, lê min ne ji ber xayintiyekê
Ji niyeta xwe ya pak gotine,
Û bi daxwazeke paqij...

ELMIRE

Jixwe ez jî vê yekê wiha qebûl dikim,
Û bawerim ku ji bo silametiya min endîşe dikî.

TARTUFFE

(Serê tiliyên wê digvêşe)

Erê, Sîtî, bêşik, eşq û heyecana min ewende mezin e ku...

ELMIRE

Of! te gelekî serê min êşand.

TARTUFFE

Ev ji ber hezkirîna min a zêde tê.

Nexwe ne ji bo ku ez te aciz bikim

tişteki welê nehatiye heşê min,

Û çêtir e ku ez...

(Destê xwe dêtîne ser çonga wê.)

ELMIRE

Ev çi destê îja?

TARTUFFE

Ez qumaşê derpiyê te dest dikim: çiqasî nermik e.

ELMIRE

Wî ji bo Xwedê destê xwe bikşîne,

zû sefete min diçe ez didiqdîqim.

(Jinik kursiya xwe bi şûn de dide,

û Tartuffe jî her ku diçe kursiya xwe ber pê de tîne.)

TARTUFFE

Tu xwedê! Ev gula tentenê ya pêxêla te çi tişteki seyr e!

Di wexta me de çi karên nedîtî tîn kirin; hergîz, di dinyayê de,

Kesî tişteki welê xweşik hatiye çêkirin nediye.

ELMIRE

Rast e. Lê divê em vegerin ser mesela xwe hinekî bipeyivin.

Dibêjin ku mêrê min ji ser soza xwe vegeyayê,

Û dixwaze keça xwe bide te. Gelo rast e, ji min re bêje?

TARTUFFE

Erê, ji min re bi kurtayî bahs kir; lê, Sifî,
Bexteweriya ku min divê ne ev e, tu rastiyê bixwazî;
Bexteweriya herî mezin a ku hemî daxwazên min
dikare pêk bîne min ber bi warekî din ve dikşîne.

ELMIRE

Mana xwe tu ji tiştêkî li ser rûyê dinyê hez nakî.

TARTUFFE

Rast e, lê dilê di sînga min de jî ne ji kevîr e.

ELMIRE

Min bawer dikir ku hemî xebata yên wek te ji bo Rebê jorî ye,
Û li ser rûyê dinyayê tiştêkî ku rê li ber vê xebata we bigre tuneye.

TARTUFFE

Evîna ku me bi xweşikiyên dinyaya wî aliyî ve girê dide
Rê li ber evîna me ya dinyaya fanî nagire;
Li hemberî ciwanîyên bêkêmasî ku Xwedê çêkirine
His û pertavên me bi hêsanî dikarin tev rabin.
Sipehîyên Wî ku li cem kesên wek we peyde bibin jî;
Lê hisn û cemala bêhempa ku daye te hemî:
Ew xweşikî û bedewîya di wechê te re nîşan daye
Dil ji mirov dibe, û çavên mirov li ber venabe,
Li hember mexlûqateke weke te bêqusûr,
Min nikaribû nebûma heyranê Rebê alemê ji kûr
Li hemberî vî sûretê ku tu dibê qey Wî Xwe bi qelemê çêkiriye
Dilê min ê sermest û evîndar nikaribû xwe bigirta,
rawestayaya li dûr.
Pêşî ez ji vî agirê dilê xwe yê nehînî ketim şikê
Min got nebe ku fikra şeytên be bidostanî min derxe ji rê;
Hette min got qey tu astengekî li ser riya Îlahî
Ji bo wê dilniya bûm ku biber çavên te nekevim tucarî.

Di encamê de tê gihîştim ku sipehîtiya herî Xwedayî
 Ev e ku ev evîn bi awayekî birûmet çareser bibe
 Ne dibe eyb û şerm, ne jî qet ne guneh e.
 Ev bû sebeba ku min dilê xwe serbest û azad kir.
 Erê ez qebûl dikim ev curret kariyeke mezin e
 Gava ku ez dilê xwe pêşkêş dikim ji bo te;
 Lê ez çibicîhbûna daxwazên xwe jî qenciya te,
 Ne ji tu xebat û xîreta xwe ya vala û neçar dipêçim;
 Hêviya min tu yî, başî û xweşiya min bidestê te ye,
 Bextewerî û bedbextiya min jî girêdayî te ye,
 Di encamê de ez dikarim, bi peyveke ku ji devê te derkeve
 Bextewer bibim, ger tu bixwazî, xemgîn jî bibim, ku bi dilê te be.

ELMIRE

Diyarkirina evîna te bi rastî jî bikubarî bû,
 Lê, ku tu rastiye bixwazî, hinekî ji bo min surprîz bû.
 Bi min wiha ye, ku divê tu li nefsê xwe baş bixwedî bî,
 Divê ku tu berî biryareke wiha bidî baş bifikirî.
 Mominekî weke te, ku li herderê dibe bahsa navê wî...

TARTUFFE

Ax! ji bo ku mirov bibe momin
 qey mirov dev ji însantiya xwe jî bernade;
 Dilê ku xweşikbûna te ya îlahî bibîne,
 Jixweber dê teslîm dibe, û tu mentiqê vê jî nîne.
 Ez dizanim ku axavtina yekî weke min bi vî awayî lirê nîne;
 Lê, Sitî, ez ne melek im tu jî rastiya min bibîne;
 Ger tu li îtirafa min nebuhurî û mahkûm bikî;
 Divê tu zanibî ku sebebê vê sipehîtiya te ya bêheşker e.
 Hema ku min şewqa mezinahiya xweşikbûna te
 ya ji mirovatîyê der dît,
 Te dil ji min bir, tu bûyî xwedî desthilat li ser heşê min.
 Şêrinahiya awirên te yên îlahî ya bêtarîf
 Zora berxwedana dilê min ê bi rik bir;
 Zora rojî, nimêj, hêsirên çavan hemîyan bir,

Hemî daxwaz û bala min bi bedewiya te bisînor kir.
 Bi çavan û bi keseran min ji te re got hezar caran,
 Ê niha jî ji bo tu baştir fêm bikî ji te re bidev dibêjim.
 Ger ku tu hinekî biheş û ruhekî xweşbîn binêrî
 Li êş û azarên vî xulamê xwe yê bêkêr û wan bibînî,
 Ger bivê ku çeyî û qencyên te dilê min xweş bikin
 Ê hete ji navê rakirina min kêmaniyê lixwe dênin,
 Tu bêjî çî ez ê hertim wek te bikim, ho mêkewa şêrîn,
 Bi softityeke nedîtî ez ê bi te ve bêm girêdan.
 Rûmeta we bi min dê bi tesadûfî jî qet neşikê,
 Ê ji bêwefayîyeke ji alî min ve jî qet nekeve şikê.
 Ev hirhopên hêbinyad ên derdorê, ku jinên wan jî tiredîn in,
 Bi tevgerên xwe mirov dêşînîn û peyvên wan jî betîbetal in,
 Bi pêşketina têkiliyên xwe yên bi jinan re xwe qurre dikin;
 Îltîfatên ku dibin û eşkere nekiribin tunene,
 Zimanê wan li dijî kesên ku baweriya xwe bi wan tînin jî tûj e,
 Ê perestgeha ku dilê wan ava dike jî reş dikin.
 Lê mirovên wek me biagirê sirveşartinê dişewitin,
 Bi kê re dibe bila bibe bisirrên xwe re sadiq in:
 Îhtîmama ku ji ber nav û dengê me tê
 Bersiva her pêdiviya heskiriya me dide,
 Ê gava bersiva evîna kesên wek me bê dan,
 Evîna bêrezalet û zewqa bêtirs bi me mimkin e.

ELMIRE

Min guhdariya te kir, lê ev peyvên xweş û geş
 Gellekî curretkar in ku tu rastiyê bixwazî.
 Ma tu qet ji ihtîmala ku ez ê karibim
 Van qewadiyên te ji mêrê xwe re bêjim,
 Ê eşkerebûna evîneke welê nelirê
 Dikare dostaniya we xera bike natirs?

TARTUFFE

Ez dizanim ku dilê te gellekî birehm e,
 Ê ku tu yê li coş û heyecana min biborî,

Ku tu yê vê zêdegaviya min a tacizker ku ji ber evîneke acizker tê
 Weke kêmaniyeye mirovî bihesibînî û li min biborî,
 Û gava tu li xweşikbûna xwe binêrî, tu yê zanibî
 Ku mirovê benderuh nekor e, ew jî wek herkesî xwclî beşer e.

ELMIRE

Kî li dewsa min bûya wê ev peyv bi awayekî din bigeranda;
 Lê ji ber ku ez bi devê xwe karim,
 Ez qet behsa vî tiştî ji mêrê xwe re nekim;
 Lê li hemberî vê ez ê tiştêkî ji te bixwazim:
 Divê ku tu bi awayekî jidil û vekirî
 Ji bo zewaca Valerî bi Marianê re bixebitî
 Dev ji tiştê ku ne qismatê te ye berdî
 Kesê ku qencyê bi hinekî din bike wê başî bê pêşiya wî,
 Jixwe...

Sehneya Çaran
 (Damis, Elmire, Tartuffe)

DAMIS

(Ji jûra piçûk a ku xwe lê veşartibû derdikeve.)
 Na, Sitî, na: divê herkesê vê yekê zanibe.
 Ez li vir bûm, û min hertişt biguhê xwe bihîst;
 Û tu dibê qey Xwedê ez ji qencya min re anîm vir
 Ji bo silûka vî durûyiyê ku jiyan li min kiriye zindan bişkînim,
 Ji bo rîya ku ez heyf û tola xwe jê bistînim veke
 Wî bidurûtî û zimandirêjiya xwe,
 Bavê min xapand, û divê em rûyê wî yê rastî
 Ku niha ji te re bahsa evîne dike derxin holê.

ELMIRE

Na, Damis: ku hinekî din heşê xwe biserê xwe de,
 Û han bide ku layiqê soza ku min dayiyê bimîne.

Piştî ku min soz dayiyê min ji ser soza min vemegerêne.
Ez heznakim ku bibe hengame dengê me zêde derkeve:
Ku mirov jin be divê mirov bitenê bi peyvên welê bikene,
Divê tucarî mirov serê mêrê xwe bi peyvên welê beradayî mêşêne.

DAMIS

Li gor xwe sebebên te hene ku bi vî awayî tevdigerî,
Sebebên min jî hene ji bo bi teherekî din mamelê bikim li gel wî.
Rizgarkirina wî ya ji vê rewşê henekpêkirina bi min e;
Êdlî divê dawî li qubedaxiyên wî
yên li paş qurretiya sofitiya wî ya derewîn
Ku ji xeynî derblêdana hêrsa min a biheq
û tevliheviya nav mala me pê ve
Bikêrî tiştêkî din nedihat bê.
Ji kengî de ye bi van çîrokên xwe hukmî bavê min dike,
Û rê li ber bexteweriya min û ya Valère digre.
Divê bavê min êdlî bes bi destê vî bêbextî bê xapandin,
Eve ji bo vê Xwedê rê nîşanî min da.
Ji bo ku fersendeke welê daye min ez deyndarê wî me,
Ev fersend jî ne ya ku mirov ji destê xwe berde:
Ku ez vê fersendê nikaribim li hember wî bikar bînim
Wê gavê heqê Tartuffe e, ku ew li hemberî min bikar bêne.

ELMIRE

Damis...

DAMIS

Na, ez ricayê ji te dikim, bihêle ku ez biya xwe bikim.
Niha ji kêfan bazkên min hebûna ez ê bifiriyama;
Bi peyv û galgalên xwe tu beleheq min ji zewqa
Stendina heyf û tolê bêpar dihêlî.
Berî ku zêde mezin bibe, ez ê wê gavê meselê hal bikim;
Eve fersenda ku min dixwest jî li ber min e.

Sehneya Pêncan
(*Orgon, Dámis, Tartuffe, Elmire*)

DAMIS

Bavo, em ê niha bihatina te re, derdora te
 Ji bûyereke ku tu jî lê şaş bimînî agahdar bikin.
 Heqê alîkarî û qencyên te li te vedigerîn,
 Mîrza Tartuffe dilovaniya te bi diyariyeke baş xelat kir.
 Rêz û hirmata xwe ya li hemberî te vekirî diyar kir:
 Wî qîma xwe bitenê bidestdirêjîya li ser namûsa te naniye;
 Û min ew li vir dema ku ji Sitî re
 Evîneke gunehkar biqubedaxî îtîraf kir di ser de girt.
 Sitî pîr dilhînîk e, û naxwaze sirra xwe ji herkesî re eşkere bike
 Ji ber vê nedixwest vê sîrrê jî ji kesî re bêje û bibilîne;
 Lê min nikaribû bêariyeke wiha qebûl bikira,
 Û ez bawerim ji te veşartina vê yekê jî, ji bo te dê heqaret bûna.

ELMIRE

Erê, min nedixwest bi pêşniyazên welê vala
 Rihetî û hizûra mêrê xwe xera bikira,
 Bi vî awayî kes nikare namûsa mirov bileke bike,
 Piştî ku mirov zanibe xwe biparêze ev têrê dike:
 Ez welê difikirim; û ku te guhdariya min bikira,
 Dámis, te yê ji kesekî re bahsa vê yekê nekira.

Sehneya Şeşan
(*Orgon, Dámis, Tartuffe*)

ORGON

Min ê ev jî bibihîsta, ho Xwedê! xwene rast e?

TARTUFFE

Erê, birayê min, ez mirovekî ne baş im, ez tawanbar im,
Ez gunehkarekî dilreş fesadekî dera han im,
Nemerde herî mezin ê rûdinyê me;
Jiyana min hemî birûreşî û leke ye;
Temenê min hemî bisûc û xirabiyên derbas bûye;
Xwiya ye Xwedê jî, ji bo min ceza bike,
Bi vê fersendê dixwaze min bi saxî bikuje.
Min bi cirmeke çendî giran karibin tawanbar bikin,
Ez dîsa jî xwe ji xurûra xweparazîne mahrûm dikim.
Ji te re çî dibêjin ji wan bawer bike, li min were xezebê,
Û min weke mêrkujekî ji mala xwe biqewirêne:
Ku ez ne misteheqê bêtirê van loman bûma,
Min ê tehemila vî qasî jî nekira.

ORGON

(Vedigere ser lawê xwe.)

Ax! hênâmûs, bi vê sextekariya xwe tu ceger dikî
Ku lekê bênî ser pakî û safitiya wî hi?

DAMIS

Çî? van delewêrên vî nermikê durû
Hemî tişt bi te dan jibîr kirin...?

ORGON

Hiş be, derewkerê melûn.

TARTUFFE

Na! bihêle bila bipeyive: tu neheqiyên lê dikî,
Him ku tu jê bawer bikî jî tu yê baştir bikî.
Bi ser bûyereke welê de tu çima hîn qenciya min dixwazî?
Tu qet fikiriyî ku piştî vê, ez dikarim çî tiştên din bikim?
Birawo, ma tu bi dîtina min a ji derve de bawer dibî?
Û piştî ku we hertişt bi çavê serê xwe dît,
hîn jî tu bawer dikî ku ez baş bim?

Na, na: tu bi tepeşa min a ji derve de bawer dibî,
 Û ez, mixabin! ji tiştê ku hûn difikirin bi tiştêkî jî ne kêmtir im;
 Hemî dinya min wek mirovekî baş dihesibêne;
 Lê tu rastiyê bixwazî ez ne hêjayî tiştêkî jî me.

(Vedigere ser Damis.)

Erê, lawê min ê delal, bêje; ji min re,
 Serserî, xayin, rezîl, diz, qatil bêje;
 Min bi peyvên ji van hîn xerabtir rezîl û riswa bike:
 Ez qet îtiraz nakim, min ev hemî heq kirine;
 Û dixwazim çong bidim, cezayê xwe bikîşînim
 Weke şerma cirmên din ên jiyana xwe biteresî.

ORGON

(Ji Tartuffe re dibêje.)

Birawo, ewende jî nabe.

(Ji lawê xwe re dibêje.)

Ma dilê te ji kevir e,

Xayin?

DAMIS

Çi? tu ewende di bin tesîra van peyvên de mayî...

ORGON

Hiş be, sextekar.

(Ji Tartuffe re dibêje.)

Birawo, ji bo xwedê rabe ser xwe!

(Ji lawê xwe re dibêje.)

Rezîl!

DAMIS

Ew dikare...

ORGON

Ez ji te re dibêjim hiş be.

Tartuffe

DAMIS

Ez teqiyam! Çi? ez...

ORGON

Ger peyveke din ji devê te derkeve, ez ê mirina te bênim.

TARTUFFE

Birawo, tu biqedrê Xwedê kî, tu yê bîhna xwe teng mekî.
Ez qayilim ji ber êş û jana herî giran binalim
Lê naxwazim ku tu çipizka xwe bi birazê bikî.

ORGON

(Dibeze lawê xwe.)

Nankor!

TARTUFFE

Destê xwe pê meke. Ji bo ku tu wî efû bikî ger bivê
Ez ê li ber piyên te sicde...

ORGON

(Wek Tartuffe çong dide erdê û wî himêz dike.)

Heyhat! tu henekê xwe bi min dikî?

(Vedigere ser lawê xwe.)

Bênamus! de bibîne ku çendî dil birehm e.

DAMIS

Nexwe...

ORGON

Hiş.

DAMIS

Çi? ez...

ORGON

Hiş be, min got.

Ez dizanim ku tu ji bo çi dixwazî êrîşî wî bikî:

Hûn hemî jê nefret dikin; û ez niha dibînim ku jina min,

Zarok û xizmetkarên min, hemî bûne yek û diranan lê tûj dikin;

Bêşerm û bêfedî li her riyê digerin,

Ku vî mominê Xwedê ji mala min dûr bikin.

Lê her ku hûn han bidin wî ji vir biqewirînin,

Ez ê jî ji bo ku bimîne tiştê ji destê min bê bikim;

Û ez ê ecele bikim keça xwe bidimê,

Ji bo ku xurûra malbata xwe bişkinim...

DAMIS

Tu dibê, tu yê bikaribî wê mecbûr bikî ji bo zewaceke wiha?

ORGON

Erê, bênamûs, heta ji îşev çêtir tuneye,

ku we di çavan re derxim.

Ax! hûm hemî ji bavê xwe bêminet in, ez ê nîşanî we bidim

Bê çawa hûn karin ji hedê xwe derbas bin

û li hemberî min derdikevin.

Heydê, berî ku bibe dereng, peyva xwe bi şûn de bistîne,

Qeşmer, xwe bavê lingê wî ji bo ku te efû bike.

DAMIS

Kî, ez? xwe bavê lingên vî mirovê durû û sextekar...

ORGON

Wey! tu hîn dipeyvî, bênamûs, û tu jê re dijûnan didî?

Tu ka darekî bidin min! darekî bidin min!

(Vedigere ser Tartuffe dibêje.)

Bi min megirin.

(Dizivire ser lawê xwe.)

Biceheme here derekeve ji mala min, bila careke din

Piyên te bi van sî û sitaran mekevin.

DAMIS

Baş e, ez ê derkevîm: Lê...

ORGON

Zû, vê derê terk bike.

Ez te ji mîratê xwe mahrûm dikim,

Rezîl û bi ser de jî naletê li te dibarînim.

Sehneya Heftan
(*Orgon, Tartuffe*)

ORGON

Mîrov wiha êrîşî qencekî xwedê bike!

TARTUFFE

Ya Xwedayê jorîn, tu wî ji ber ezabê ku da min efû bikî!

(*Vedigere ser Orgon.*)

Xwezka te zanibûya ku ji ber xîretkêşiya wan a ku dixwazin

Min li hemberî te, birayê min, fedîkar derxin çendî nefret dikim...

ORGON

Mixabin!

TARTUFFE

Bitenê li vê nankoriyê ramiyan jî,

Ji bo min ezabekî welê ye ku...

Ez ewende jê nefret dikim ku... Dilê min ewende êşiya,

Ku ez nema karim xeberdim, û ez dibêm qey ez dikim bimrim.

ORGON

(*Hêsirên wî wek ba û baranê heft û heşt li bin guhê hev dikevin*
û ber bi deriyê ku lawê xwe tê re qewirandibû bazdide.)

Xenzîr! ez poşman im kero, lê ez çi bikim tu ji destê min filitî

Çima min tu nekirî qurbana xwe û wî, li vir geber nekirî.

(Vedigere ba Tartuffe.)

Bêhna xwe fireh bike, birawo, hêrs mebe.

TARTUFFE

De dev jê berde,

dev ji vê minaqeşa bêhna mirov teng dike berde.

Ez dinêrim ku ez dibim sebebê gelek tevliheviyan li vê malê,

Û ez dibêm qey êdî wexta ku ez ji vir herim hatiye û derbas bûye jî.

ORGON

Çawa? tu henekên xwe dikî?

TARTUFFE

Ji min nefret dikin, û ez dibênim ku dixwazin

Te ji min sar bikin û baweriya te ya bi min bişkênin.

ORGON

Çi dibe? Tu dibêji qey ez guhdariya wan dikim?

TARTUFFE

Bêşik, ew ê rihet rûnenên, ji niha û vir de jî vala nesekinin;

Û ev bêbextiyên ku te îro baweriya xwe bi wan nanî

Belbî rojek bê ku tu baweriya xwe bi wan bênî.

ORGON

Na, birayê min, hergîz tiştê wiha nabe.

TARTUFFE

Ax! birawo, herdem bi hêsanî

Jinek dikare fikra mêrê xwe biguherêne

ORGON

Na, tiştê wiha nabe.

TARTUFFE

Îzna min bide ku ez zû, ji van deran bidûr kevim,
Da ku ew careke din fersenda ku êrîşî min bikin nebênin.

ORGON

Na, tu yê her bimênî: heye ku ez hebim tu yê jî li vir bî.

TARTUFFE

De bila wek te be; xwiyaye ku divê ez hîn jî
Ezêb bikşênim, madem ku tu dixwazî...

ORGON

Ax!

TARTUFFE

De ka em vê meselê bigrin; hew jê xeberdin.
Ez dizanim ku di rewşeke wiha de divê mirov çî bike.
Barê namûsê giran e, û dostaniya min û te min mecbûr dike
Ku ez rê li ber her cûre paşgotinîyê û fesadiyê bigrim.
Ez ê ji xanima te dûr herim, û tu yê min pê re nebînî careke din...

ORGON

Na, tevî hertiştî, tu yê wê hertim bibênî.
Ji bo min kêfxweşiya mezin dîn û harkirina herkesî ye,
Û ez dixwazim ku herdem ew te pê re bibênin.
Peyva min neqediyaye, ez ê hîn bêjim: ji bo baş ji heqî wan
derkevim
Ez qet naxwazim ku ji te pê ve kesekî din bibe wêrisê malê min,
Û helbet ji bo wê jî da ku hemî baş fêm bikin,
Ez ê hemî mal û milkên xwe li ser te tapo bikim.
Dostekî qenc û dilzoz, ku ez wî wek zave bipejirênim,
Ji min re ji kurr, jin û hemî lêziman jî pêş de tir e.
Min jî tu hilbijartî, ma tu pêşniyaza min qebûl nakî?

TARTUFFE

Ez dikarim bê m çî, emrê xwedê di ser hertiştî re ye.

ORGON

Rebenê Xwedê! Heydê zû em peymanekê çêkin,
Wesyetên xwe lêkin, ku hemî jî kerban biteqin!

PERDEYA ÇARAN

Sehneya Yekê (*Cléante, Tartuffe*)

CLÉANTE

Erê, herkes bahsa vê yekê dike, baweriya te ji Xwedê be,
 Ev gotegot û welwele qet bi şan û şerefa te nakeve;
 Ê vaye tam di wexta wê de min tu zeft kirî, Mîrza,
 Ez jî dixwazim bi du peyvan fikra xwe ji te re bêjim.
 Ez ê zêde li ser tiştên ku min bihîstiye ranewestim;
 Ez dixwazim van tiştan hemî bicîh bihêlim û bêm ser meselê.
 Em ferz bikin ku, Damis li hemberî te bêrêfî kiriye,
 Ê em bêjin bila neheqî li te kiribe û ji tune de te tawanbar kiribe:
 Ma dema kesek êrîşî mirov jî bike, efûkirin,
 Ê ji dil avêtina hissên heyfhlilanînê ne şertê xiristiyaniyê ye?
 Ê ji bo ku hûn li hev nakin, ma divê
 Ku kurr derbeder bibe û biterikîne mala bavê?
 Ez ji te re careke din dibêjim, û vekirî dipeyivim,
 Biçûk û mezin tevde herkes li dijî vê yekê ye;
 Ê ger tu biya min bikî, tu dikarî herkesî aş bikî
 Ê nehêlî ku mesele bigihê heta vê radeyê.
 Hemî hêrsa xwe bispêre xatirê Xwedê,
 Ê bila xêra te be, lihev bîne kurr û bavê.

TARTUFFE

Heyhat! ku tu ji min bipirsî,
 ez jî vê yekê ji dilê sidqane dixwazim:

Baweriya te ji Xwedê be Mîrza,
 ez jê biqendî serê derziyê ne acizim;
 Ez vê yekê jê re nakim kêmanî,
 li hemî tiştên ku wî kirine dibuhurim,
 Û hetta ku ji min tê, ez ji dil û can qenciya wî dixwazim;
 Lê Xwedê jî vê yekê hergîz wiha qebûl nake,
 Û ger ew bi şûn de vegere, divê ku ez ji vê malê herim.
 Piştî tiştê ku wî bi min kir, ku kesî nedîtiye nebînaye,
 Dan û sitendina di navbera min wî de bêfêde ye:
 Xwedê dizane ku wê xelk û alem ji me re çi bibêje!
 Ku ez weke te bikim jî ew ê bêje qey fen û hîle ye;
 Û wê herkes bêje qey ez tawanbar im,
 Û ji bo gunehê xwe bidim efûkirin û devê wî ji ser xwe bikim,
 Ez jê bitîrs im û dixwazim wî bi awayekî îkna bikim,
 Têxim bin destê xwe û bi devê wî bigrim.

CLÉANTE

Bi van mahnên wiha tu dixwazî me jirê bibî,
 Sedemên ku tu didî ber rûyê xwe, Mîrza, vala ne hemî.
 Pêkanîna karê Xwedê biserê yên wek te ketiye?
 Ji bo tawanbaran ceza bike xwene pêdiviya wî bi me heye?
 Dev jê bigere, bihêle bila ew bixwe heyfa xwe hilîne:
 Tu bitenê, weke ku ew emir dike, zanibe şaşiyên efû bike;
 Û qet guh mede peyv û galgalên faniyan,
 Wexta tu bi ya Xwedê bikî wê heq cîhê xwe bibîne.
 Çawa? Nexwe ji bo rê li ber tesîrên xirab veneke
 Tu dixwazî xwe ji rûmeta pêkanîna kiryareke baş bêpar bikî?
 Na, na divê mirov herdem Xwedê çi emir kiribe wê bike,
 Heş û mêjiyê xwe bi tiştêkî din tevlihev meke.

TARTUFFE

Min hîstika din jî ji te re got ku min ew li bal dilê xwe efû kiriye,
 Ev yek jî, Mîrza, cûreyekî pêkanîna emrê Xwedê ye;
 Lê piştî rezalet û şerê îro, ez dibêjim qey
 Xwedayê min dê îzin nede ku ez pê re bijîm.

CLÉANTE

Û qey Xwedayê te, Mîrza,
 îzin dide ku tu guhê xwe bi ser peyveke
 Ku bibêhemdî ji devê bavekî derketibe bibelikînî;
 Û dewlemendiyeke ku bi rastî jî
 Qet neheqê te be, bêjî qediya çû qebûl bikî?

TARTUFFE

Kesên ku min nas dikin îhtîmalê nadin, dizanin
 Ku ez ê li gor berjevendiyên xwe yên şexsî hereket nekim.
 Hemî nîmetên li ser rûyê dinyê, ji bo min nakin serê derziyê
 Şaşa wan a derewîn qet nikare min ji rê derxe;
 Ger min biryar dabe ku pêşniyaza bavê
 Û mîratê ku dixwaze bide min qebûl bikim,
 Ev ji ber tîrsa min a ku ez naxwazim
 Ev dewlemendî bikeve destê cahil û nezanan,
 Ji ber ihtimala ku ew dikare bikeve destê kesên
 Ku wê di rîya xirab de bikar bînin,
 Û weke ku ez dixwazim dê di rîya heq de bikar neyê,
 Dê ne ji bo mebesta qenciya mirovî,
 bi niyeteke xirab bikar bê, tê.

CLÉANTE

Hê, Mîrza, van metirsî û wesweseyên xwe
 Yên xweşik, ji wêrisekî meşrû re bihêle
 Tu bêyî ku tiştê li mazatê hebe serê xwe mêşîne,
 Bila xwediyê wî serê xwe bi xeterên malê xwe re bêşîne;
 Vê jî baş zanibe ku ji dêvla hinek bêjin te perên wî dizîne,
 Ew vê serweta xwe di riyên xirab de winda bike çêtir e.
 Ez şaş û mat dimînim ku tu çawa bêşerm û fedî
 Pêşniyaza malxwê malê bêdudilî qebûl dikî;
 Nexwe qaîdeyekî dîndariya heqîqî
 Ya ku mirov dest bide ser malê wêrisekî meşrû heyê?
 Ger Xwedê avêtiye dilê te ku maniekî te heyê

Û tu nikarî bi Damis re di malekê de bijî,
Li şûna ku tu xwe li valayiyê welê helak bikî
Û lawê malê ji bo berjevendiyên xwe derbeder bikî
Ne çêtir e, ku tu wek mirovekî kubar ji vir biçî,
Li ser qîmet û rûmeta xwe li mala xwe vegeirî
Bawer be, Mîrza, ji kesekî weke te biheysiyet
Mîrov bitenê...

TARTUFFE

Saet sisê û niv e, Mîrza:
Divê ez çend ferz dia û taetê bikim li jor,
Ji ber ku ez te wiha bitenê dihêlim li min bibor.

CLÉANTE

Ya!...

Sehneya Duduyan
(*Elmire, Mariane, Dorine, Cléante*)

DORINE

Ji bo Xwedê, tu jî bi me re alîkariya wê bike,
Mîrza: Ji ber êş û azara rewşa ku tê de ye dike bimre,
Û biryara zewaca ku îşev bavê wê daye
Her ku diçe, wê yekcar, bêhêvîtir dike.
Bavê wê dike bê. Divê em xwe bikin yek, ez hêviyê ji te dikim,
Bi zor dibe bi fen û delewêran dibe, divê ku em rê nedin
Da ku ev bextereşiya ku heşê me hemiyar ji serê me bir pêk bê.

Sehneya Sisiyan
(*Orgon, Elmire, Mariane,*
Cléante, Dorine).

ORGON

Ha! pîr baş bû ku min hûn hemî li vir li bal hev dîn:
(*Vedigere ser Marianê.*)
Ev peymana di destê min de dê te baş bikenîne,
Helbet tu tê digihêyî ku ez dixwazim bêjim çî.

MARIANE

(*Çong dide erdê.*)
Bavo, tu bi navê Xwedayê ku bitenê ew bi derdê dilê min zane,
Û bi serê hemî kesên li ber dilê te şêrîn in kî,
Tu yê hinekî mafên xwe yên bavîtiyê li aliyekî bihêlî,
Û min mecbûr mekî tiştê ku naxwazim sirf ji bo xatirê te bikim;
Vî mafî, li hemberî min bi dijwarî heta radeya, ku ez ji ber berpir-
siyariyên xwe yên li hemberî te,
gazinan ji Xwedê bikim, bikar mêne,
Û vê jiyana ku, mixabin! te daye min,
Reş meke, bavo, li pêş çavên min.
Ger, tu yê tevî hemî daxwaza min,
Min medî delaliyê ber dilê min,
Bila qenciya te be, ez li ber piyên te digirim,
Qet nebe, ji ezabê yê ku ez jê nefret dikim xelas bike min.
Bi bikaranîna hemî desthilata xwe li ser min
Min bêhêvî meke, ez ricayê ji te dikim.

ORGON

(*His dike ku nerm dibe.*)
Heydê, hiş be dilê min, niha ne wexta zeaf û jariyê ye.

MARIANE

Ez qet liber nakevim ku tu ewende jê hez dikî;

Dilovaniya xwe vemeşêre, hemî mal û milkên xwe bide wî,
Û ku têrê nekir, nehê min jî li ser dehê wî:
Ez ji dil dibêjim, bila para min jî ji wî re be hemî;
Qet nebe bi min melîzin, min nexin nava vî karî
Û destûra min bidin ku ez rojên xwe yên mayî
Ku qey Xwedê kiriye para min
li tenahiya dêrekê bibuhêrim bixemgînî.

ORGON

Ax! bi rastî jî eve yeke din ji dîndarên me,
Ku bavê wan li hemberî agirê evîna wan derbikeve!
Wê gavê dixwazin bibin rahîbe. Rabe ser xwe!
Çendî tu jê nefret bikî jî, ev zewac ewende baş e ji bo te:
Bi vê zewacê fêrî veşartina hissên xwe bibe,
Û serê min bes zêde bêşîne.

DORINE

Ev çi bobelat bû ku bi serê me de hat...?

ORGON

Hela, tu hiş be; berî ku pirs ji te bê kirin bersiv mede:
Ez qebûl nakim ku peyveke din ji devê te derkeve.

CLÉANTE

Ger tu destûra min bidî ku ez çend şîretan li te bikim...

ORGON

Birayê delal, di dinyayê de kesek nizane wek te şîretan bike,
Şîretên te ne vala ne, û rêz û hirmeta min jî ji van re heye;
Lê tu yê bibînî ku ez guhdariya wan nekim çêtir e.

ELMIRE

(Ji mêrê xwe re dibêje.)

Li hemberî van bûyeran hemiyan, ez nizanim ku ez ê çi bêjim,
Ewende çavên te tarî bûne ku ez li te şaş dimênim:

Ji bo ku mirov bûyera îro li ber çavan bû înkâr bike,
Bi rastî jî, divê mirov baş bixwe bawer û amin be.

ORGON

Kî dibêje ku ez bi tiştên li ber çavan bawer nabim,
ez xulamê te me.
Ez dizanim ku tu ji bo çî guh nadî gotinên wî serseriyê kurê min
Tu tirsîyayî ku, rastiya lîska
Ku aniye serê vî rebenê bêçare derxî holê;
Ji bo ku min ji te bawer bikira diviya tu ne ewende sakîn bûya
Berevajîya wê diviya tu bitirs û heyecan bûya.

ELMIRE

Qey min îtîrafeke besît a aşîqekî ji ser xwe çûyî
Nedikir mesela namûsê û ez hêrs nedibûm?
Ma diviya ji bo her gotin û tevgera wî min xwe biqêheranda
Û devê xwe pê bikira dijûn jê re bidana?
Tu ji min bipirsî, ez ê li hember pêyvên welê bitenê bikenim,
Û qet hez nakim li ser tiştên welê bêmane bisekinim;
Ez hez dikim ku mirov bi awayekî şêrîn ciddiyeta xwe nîşan bide,
Û ez qet ne alîgirê ku mirov bixwaze pîrsgirêkên namûsê
Bi awayekî hişk û kûvî, bi lepûşk û diranan hal bike,
Û peyva herî sivik jî li nav çavên mirovan bixe:
Xwedê min ji hal û hereketêke wiha biparêze!
Ez rûmetêke pîrî pak û neşeytanî dixwazim,
Û ez bawerim ku bi redkirineke kubar û sar
Mirov hêza ku diberxwebide bi tu dilî re nahêle yekcar.

ORGON

Welhasil ez hertiştî dizanim û kes nikare fikra min biguhere.

ELMIRE

Ez li vê zeafa te ya seyr careke din şaş û mat mam.
Ger ez ji te re îsbat bikim ku hemî tiştê ji te re hatiye gotin rast e,
Ez mereq dikim, gello dê hîn jî bimîne şik û şibha te?

ORGON

Îsbata çi?

ELMIRE

Îsbata rastiyê.

ORGON

Ji min re çîrokan mebêjin.

ELMIRE

Lê îja çi? tu dixwazî ku ez riyekê bibînim
Û bi awayekî vekirî nîşanî te bidim?

ORGON

Ji kumê min re bêje.

ELMIRE

Tu çawa mêrî! Qet nebe bersiva min bide.
Ez ji te re nabêjim bi gotina min bawer be;
Lê em ferz bikin ku li vir, li cîhekî diyarkirî,
Ku te hertişt biçavê xwe dît û biguhê xwe bihîst,
Wê gavê tu yê ji merivê xwe yê momin re çi bêjî?

ORGON

Di rewşeke welê de, ez ê bêjim ku... Ez ê tiştekî nebêjim,
Jixwe tiştekî welê ne mimkun e, nabe.

ELMIRE

Ewqas xeflet jî zêde ye,
Êdî bes e me çi got te em derewker derxistin.
Divê sirf ji bo ku ez dilê xwe rihet bikim, nêzîk nedûr,
Tu yê bi çavê serê xwe rastiya tiştên ku ji te re hatine gotin bibînî.

ORGON

Bila wek te be: ez ê vê peyva te jibîra nekim.

Em ê meharetên te bibînin,
Em ê binêrin bê tu yê çawa peyva xwe binî cîh.

ELMIRE

Ji min re ban Tartuffe kin.

DORINE

Pirr qurnaz e, hayê te hebe jê,
Ku mirov wî di ser de bigre dê bikeve xefikê.

ELMIRE

Na; mirov birihetî ji alî hezkiriya xwe ve tê xapandin.
Beleheq negotine, 'Li ser nefsê mirov xwe davê hefsê.'
Ji min re bankinê bila dakeve bê.
(*Ji Cléante û Mariane re dibêje.*)
Û hûn jî biçin.

Sehneya Çaran
(*Elmire, Orgon*)

ELMIRE

Em ê vê masê bi ber xwe de bînin, û tu bikeve binî.

ORGON

Çawa yanî?

ELMIRE

Divê tu niha hete karibî xwe baş veşêrî.

ORGON

Çima bin vê masê?

ELMIRE

Oy, ji bo Xwedê! niha tu nahêlî:
Helbet tişteki ku em jî zanin heye, tu yê encamê bibînî.
Bikeve binî, ez ji te re dibêjim; û ku tu aciz bûyî jî,
Divê heta ji te bê tu nehêlî ku ne kes te bibîne
û ne dengê te here kesî.

ORGON

Ez dizanim ku ez zêde misamehekar im li hemberî te;
Lê de ka em bibînin bê tu yê çawa ji binê vî barî derkevî.

ELMIRE

Tu mereq meke, ez çawa ji binî derdikevim tu yê niha bibînî.
(Ji mêrê xwe yê ku di bin masê de ye re dibêje.)
Ez ê bahsa mijarekê bikim ku, tu yê qet hêviya tişteki welê nekî:
Divê tu qet hêrs nebî, xwe tevnêdî û dengê xwe nekî.
Çi bê devê min ez ê bêjim, divê tu ji nihave îzna min bidî,
Û weke min soz daye, ez ê welê bikim ji bo tu hawer bikî.
Madem min ev yek lixwe danî, ez ê dibêrê dilê wî bidim bişêrîni,
Heta perda li ser çavê vî sextekarî bidim alî,
Rê bidim daxwazên wî yên bitir ên evînî,
Meydanê fireh bikim li ber curetkariya wî.
Madem ez ê ji bo te îkna bikim, û nîşan bidim rûyê wî yê rastî,
Û bikim ku weke ez didim bersiva daxwazên wî,
Wê gavê heta ku te baş qinyata dilê xwe pê anî,
Ez ê biencam bihînim mesela wî.
Rêlêgirtina daxwaza bêrê ya wî,
Paraztina jina te karê te ye, û heta radeya tu fikra xwe biguherî
Duçarbûna min a xeterê li berjevendiya te ye.

Sehneya Pêncan
(*Tartuffe, Elmire, Orgon*)

TARTUFFE

Ji min re gotin ku tu dixwazî li vir bi min re bipeyivî.

ELMIRE

Erê. Hin sirrên ku ez dixwazim ji te re bêjim hene.
Lê berî ku ez ji te re bêjim ji kerema xwe re derî bigre
Baş li herderê binêre bila kes me nebîne.
Divê weke cara din li me neyê
Serê me dîsa nekeve belayê.
Tucarî bi serê min de nehatibû tişteki welê.
Damis, ji bo te ez pîr tirsandim vê carê,
Û te bi çavê serê xwe dît ku heta hate ji destê min
Min xwest ez wî aş bikim û ji ser fikra wî vegefinim.
Birastî jî, ez ewende şaş û mat mabûm,
Ku fikra ez lê bidim mandelê jî nehat bîra min;
Lê dîsa jî, mala Xwedê ava, hertişt lirê bû,
Êdî tişteki ku em jê bitirsin nema çû
Bi saya rêz û hirmata ji bo şexsê te bahoz derbas bû,
Şik û şibha mêrê min ji te nema çû.
Ji bo ku em rê li ber paşgotinîyên xêrnexwazan bigrin,
Ew bixwe dixwaze ku em herdaîm bi hev re bin;
Ji bo vê jî ez nema ji şermezarkirinê ditirsim,
Li paş vî deriyê girtî bitena serê xwe bi te re dimînim,
Û dîsa ev yek destûra min dide ku dilê xwe ji te re vekim
Belbî hinekî jî zû agirê dilê te hînik bikim.

TARTUFFE

Birastî jî ez tişteki ji te fêm nakim tu dixwazî çi bêjî,
Sitî, tu berî niha bi awayekî din dipeyiviyî.

ELMIRE

Ax! helbet ku tu ji ber bersiveke welê neyînî hêrs dibî,
 Mana xwe dilê jinekê çawa ye tu qet pê nizanî!
 Û xwiyaye tu baş nizanî ku dixwaze çi bibêje
 Gava ku di rewşa herî jar de dixwaze xwe diparêze!
 Rûmeta jinekê di bin şert û mercên wiha de
 Herdem bi hissên wê re di berxwe dide.
 Di rewşên wiha de, sebebên evîna me çi dibe bila bibe,
 Mirov hertim şerm û fedî dike ku îtiraf bike;
 Mirov pêşî xwe diparêze, lê di vê xwe paraztinê de jî,
 Kes nikare veşêre ku dilê mirov teslîm bûye,
 Ku dor tê ser daxwazên me ji şerman devê me nagere,
 Em tim 'Pêşî dibên me navê, lê paşê digrin binavê'.
 Bêgûman mimkune ku ev îtiraf bi te pîr serbest bê,
 Û dibe ku rûmeta min hinekî pê bişkê;
 Lê piştî ku carekê peyv ji devê mirov dertê,
 Ger peyvên te yên evîni bi min xweş nehata,
 Ma min ê qet bixwesta bi devê Damis bigirta,
 Guhên xwe bi ser te de ewende pêl bikira,
 Demeke dirêj guhdariya gotinên te bikira,
 Bûyer bi vî awayî bixweşî qebûl bikira?
 Û piştî ku min bixwe xwest ku zorê bidim te
 Ku tu dev ji zewaca ji te re hatiye pêşniyazkirin berdî,
 Te negot ez dixwazim çi bêjim ji te re bi vî awayî,
 Ne ji ber meyla min a bi ser te de ez mabûm heyirî,
 Bîhna min ne ji ber vê girêka kor ku venedibû
 Û ku min nedixwest ez te bi destê kesî din ve berdim teng bû?

TARTUFFE

Şik tê tune ye, Sitî, bexteweriya herî mezin ew e
 Ku mirov van peyvên ji devê hezkiriya xwe bibihîze:
 Te bi van peyvên xwe dilê min ewende hînik kir
 Ku min heta niha hîra tiştekî wiha nedibir.
 Daxwaza min a herî mezin, hezkirina te ye ji min,
 Bi rastî jî deyndarê daxwazên te ye dilê min;

Lê dilê min niha li vir serbestiyê ji te dixwaze
 Ku ceger bike ji vê bexteweriyê hinekî şikê bike.
 Ez dikarim van peyvên te bi daxwazeke di cih de weke
 Ji bo min mecbûr bikî ku dev ji zewaca bi Marianê re berdim;
 Ger ku tu bixwazî ez ji te re rastiya dilê xwe bêjim,
 Ez ê qet bi pêşniyazên ewende şêrîn qebûl nehim,
 Ku tu hinekî biheskirina xwe, dilê min xweş nekî,
 Wekî din kî ji min re çi bibê qinyata dilê min nayê pê,
 Kes nikare bawerîya min bi heskirina te
 Û peyvên xweş ku tu ji min re dibê bîne.

ELMIRE

(Ji bo mîrê xwe agahdar bike dikuxe.)

Çi? bi vê lez û beza xwe tu dixwaze çi bikî,
 Tu dixwazî kaniya dilê min ji niha ve ziwa bikî?
 Mirina xwe didim ber çavê xwe dilê xwe ji te re vedikim;
 Bi ser de ev jî hîn têra te nake,
 Û hete fedekariya dawîn nekim ku dikare vî karî têk bide
 Tu dibêjî dilê min rihet nabe?

TARTUFFE

Tiştên ku mirov ne layiqî wan in,
 yên mirov ji wan kêr bigûman in.
 Beleheq negotine, "Bi xweziya dest naghê baqê keziya."
 Wadên ku tîn dayin çendî jî sipehî û qenc bin,
 Ku mirov ji wan îstîfade neke bawerî pê nayê kirin.
 Ez rebenê Xwedê, ku ewende hindik layiqê qenciya te me,
 Bawer nakim ku daxwazên min hakhaka pêk bîn;
 Û ez ê ji tiştêkî te bawer nekim, Sitî,
 Ku tu bitevgera xwe heskirina xwe îsbat nekî.

ELMIRE

Ji bo Xwedê, evîna te çendî xedar û dijwar e,
 Te ez gêj kirim heş û aqil ji serê min bir!
 Tu çendî zû tesîrê dikî dil ji mirov dibî,

Û hertiştê dixwazî çendî bi zor dixwazî bikî!
Wekî din çi? Ma tu nahêlî mirov xwe bixemîlîne jî,
Û tu yê fersenda ku mirov bihna xwe vede jî nedî?
Him, bihelwesteke ewende bihişkî,
Bêminaqeşe bidest bixî tiştê ku tu dixwazî,
Ma dibe ku tu hemî hêz û karebûna xwe bikar bînî
Û ji qelsiya mirov a li hemberî xwe îstîfade bikî?

TARTUFFE

Lê madem tu biçavekî baş li hezkirina min dinêrî
Tu çima vê xweşbîniya xwe bi awayekî eşkere îsbat nakî?

ELMIRE

Lê mirov çawa dikare razî bibe bi tiştên ku tu dixwazî,
Bêyî gunehkariya li hemberî Xwedayê ku ji devê te nakeve navê
wî?

TARTUFFE

Ger bitenê ji bo vê tu li hemberî daxwazên min derdikevî,
Ez dikarim vê mahna te jinavê rakim pirr bihêsanî,
Û divê ev jî li pêş heskirina te ya ji min nebe manî.

ELMIRE

Lê te em ji gunehkariya li hember Xwedê ewende tirsandine!

TARTUFFE

Ez dikarim van metirsiyên te yên ku
kenê guran pê tê tune bikim,
Sitî, û ez hunerê ku dudiliya te jî ji navê rakim dizanim.
Xwedê, hirastî jî, mirov ji hin zewqan mahrûm dike;
(*Bibêsermî gotina xwe didomîne.*)
Lê rîya ku mirov pê re lihev bike jî heye;
Ji bo her lazimî û pêdiviyê, fitweyek jî heye
Da ku mirov pê wijdana xwe rihet bike
Û guneh û xerabiyên kiryarên xwe

Bi saya niyeta xwe ya pak ji holê rake.
 Ez ê kêmaniyê neximê, Sîtî, ji bo van siran fêrî te jî bikim;
 Bitenê tiştê ku tu yê bikî, divê tu bêtirs û bêxem bî.
 Qet metirse û daxwaza min bicih bîne:
 Ez im kefilê gunehê te, û hertiştî didim ser xwe.
 Tu kuxukeke pirr hişk dikî, Sîtî.

ELMIRE

Erê, halê min tuneye.

TARTUFFE

Tu naxwazî tasek şerbeta sûsê vexwî?

ELMIRE

Ev bapêşeke ku ji mirov nare, bêguman; û ez baş dizanim
 Ku hemî şerbet û şirûbên li ser rûyê dinyê nikarin tiştêkî bikin pê.

TARTUFFE

Ev birastî jî mirov pirr aciz dike.

ELMIRE

Erê, mirov nizane dê çi bike.

TARTUFFE

Welhasil dudilî û metirsiya te bi hêsanî çareser dibe:

ELMIRE

(Piştî ku careke din dikuxe dibêje:)

Di encamê de xwiyaye divê ku ez nema di berxwe bidim,
 Te çi xwest, çare nîne divê ku ez wek te bikim,
 Berevajiya vê ez nikarim îdia bikim, bêjim
 Ku min tu memnûn kirî, û ku min xwest xwe teslimî te bikim.
 Bêşik ez ji mezinkirina vê meselê heta vê radê ne xweş im,
 Û bi rastî jî ne bidestê min bû ku min ev tişt hemî qebûl kirin;
 Lê piştî ku bi rik ez ji bo vê yekê tîm mecbûr kirin,

Madem hawerî bi tiştê ku ez dibêjim nayê kirin,
Û ji bo hawerkirinê hin sedemên din tên xwestin,
Wê gavê divê ez vê yekê qehûl bikim û te jî memnûn bikim.
Ger ku ev razîbûn bibê sebeba hin gunehan,
Divê para yê ku zorê li min dike be tawan;
Hergîz divê qebêhet nebe ya min.

TARTUFFE

Erê, Sitî, ez gunehê te hildigrim ser xwe; û ev mesele jî ji xweber...

ELMIRE

Hinekî derî veke. û binêre, ez ricayê ji te dikim,
Gello ne li van deran e mêrê min.

TARTUFFE

Ma divê ku tu ji bo mirovekî welê, ewende netebitî û biqepiçî?
Tu dikarî bi guhê wî bigrî tû hibî ser avê û dîsa tû hînî;
Ew bi hemî têkiliyên me dilşad û bextewer dibê,
Min welê lê kiriye ku her tiştî dibîne, lê bi tiştêkî jî bawer nabe.

ELMIRE

Tişt nabe: dîsa jî, tu derkeve, ez ricayê ji te dikim,
Li vî alî wî alî, li her derê, li derve baş binêre.

Sehneya Şeşan
(*Orgon, Elmire*)

ORGON

(*Ji bin masê derdikeve.*)

Ev birastî jî mirovekî kirêt e, divê ez îtiraf bikim!
Ji ber tiştê ku hatiye serê min, ez ê hişê xwe wenda bikim.

ELMIRE

Te got çî? tu yê ewende zû derkevî? tu henekê xwe bi mirov dikî?
 Xwe têxe bin perdê, niha ne wexta ku tu derkevî;
 Ji bo tu baş bawer bikî divê tu rawestî heta dawî,
 Divê tu bi fersendên piçûk zêde nexapî.

ORGON

Na, li cehnimê jî mirov nikare li kesekî wiha rast bê.

ELMIRE

Hella hella! divê tu ji tiştên welê sivik zûka bawer mekî.
 Bihêle ez rûçikê wî yê rastî nîşanî te bidim,
 ji bo tu baş bawer bikî,
 Bise qet ecele meke, ji bo tu careke din pê neweritî.
 (*Mêrê xwe dide paş xwe.*)

Sehneya Heftan
 (*Tartuffe, Elmire, Orgon*)

TARTUFFE

Ji bo daxwaza min pêk hînî, her tişt lirê ye, Sitî:
 Min bi çavê serê xwe li her aliyê malê nêrî;
 Ne ins û ne cins, kesek tune ye; tu heşê min ji serê min dibî..
 (*Tartuffe çepên xwe ji hev dike, dixwaze Elmirê himêz bike,*
Elmire xwe dide alî, Tartuffe û Orgon tên hember hev.)

ORGON

(*Tartuffe dide sekinandin.*)
 Hela raweste! xwiya ye agirê evînê li serê te xistiye,
 Hinekî giran be bila ewende zû heşê te ji serê te neçe.
 Wax! wax! hela ji xwe re li sofiyê me binêrin,

dixwaze min bixapîne!
Xwiyaye xerabî ketiye xwîna te!
Tu yê him bi keça min re bizewicî, û him jî jina min ji rê bibî!
Ji mêj de ye ez ji gotinên di derheqê te de bişik bûm,
Min bawer dikir ku ew ê jî fikrên xwe
yên di derheqê te de biguherin;
Lê ewende şahid û delîl têrê dikin:
Min bixwe dît, bes e, tiştêkî zêde êdî navê, ji bo min.

ELMIRE

(Ji Tartuffe re dibêje.)

Ez nelayiqê ku van tiştan hemiyar bikim bûm:
Lê ez mecbûr mam ku vê mamelê bi te re bikim.

TARTUFFE

Çi? tu bawer dikî...?

ORGON

Heydê, hêvî û rica min ji te heye, bêqerebalixî.
Seremonî navê, tu yê li van sî û sitaran nese kinî.

TARTUFFE

Niyeta min...

ORGON

Niha ne wexta peyv û gotinanê ye:
Divê ez piyê te careke din nebînim li vê malê.

TARTUFFE

Divê tu biçî, kî kê diqewirîne ji mala kê:
Ev mal ya min e, ez dikarim îsbat bikim ku te bivê,
Û nîşanî te bidim ku ev hîle û dek hemî mahne ne,
Ji bo şerê min, nehewceyî çiv û dolaban e,
Tu nikarî van derewan li min bîkî,

Min bi fitnetî û durûtiyê tawanbar bikî,
 Ez ê heyf û tola xwe, ji yên ku li qarşî Xwedê derdikevin
 Ê dixwazin min ji vir biqewirînin hilînim.

Sehneya Heştan
 (Elmire, Orgon)

ELMIRE

Ev çi peyv in? û ev dixwaze çi bibêje?

ORGON

Bidîn û îman ez jî nizamim, ez mat mam, ev ne karê heneka ye.

ELMIRE

Çawa?

ORGON

Ji peyvên ku dibêje ez tê digihêmin ku min çi çewtî kiriye,
 Mesela wêrisiyê heşê min ji serê min biriyê.

ELMIRE

Wêrisiya çi?

ORGON

Erê, mesele qediya ye çûye
 Lê hîn hin tiştên din hene ku min ditirsînin.

ELMIRE

Çiyê din?

ORGON

Tu yê niha bibînî. Lê berî hertiştî
 Divê em li jorê binêrin bê sindoqa me hîn li ciyê xwe ye.

PERDEYA PÊNCAN

Sehneya Yekê
(*Orgon, Cléante*)

CLÉANTE

Tu wiha bi ku de baz didî?

ORGON

Ax! ez çî zanim, derdê sotin nayê gotin?

CLÉANTE

Wiha xwiyaye

Divê em berî ku dest pê bikin baş bi hev bişêwirin
Bê ka ji bo vê yekê em dikarin çî bi hev re bikin.

ORGON

Ev mesela sendoqê min ker û gêj dike;
Ji hertiştî bêtir ew min ditirsêne.

CLÉANTE

Nexwe tiştêkî girîng di vê sendoqê de heye?

ORGON

Erê, emanetekî rebenê hevalê min Argas tê de heye,
Wî bixwe, bidizîka, dabû destê min:
Dema ku reviyabû, baweriya xwe bi min anîbû,
ji bo wê dabû min;

Û biqendî ku karibû ji min re bigota, ev hin kaxezên,
Ku jiyana û malê wî karin texin xeterê.

CLÉANTE

Wê gavê te çima ew bi destê hinekên din ve berdan?

ORGON

Ev ji ber meseleyeke wijdanî bû:
Ez yekser çûbûm cem wî bêşerefi min jê re gotibû;
Û ez bi tiştên ku ji min re gotin bawer bûm
Ji bo li cem xwe hilêne min sendoq da wî,
Gava pirsîyan çêbûbûna, ji bo mandelê, bi vî awayî,
Min ê ji xwe re rîya revê bidîta,
Dil û wijdanê min dê rihet hûbûna
Berevajîya rastiye min ê sond bixwarana.

CLÉANTE

Biqendî ku ez dibînim, rewşa te ne xweş xwiyaye;
Sirra sendoqê, jê re hiştina mal û milkê te,
Hemî jî, ger tu fikra min bipirsî,
Ne karê aqîla ye tiştên ku tu dikî.
Bi wadên welê hîn tu yê gelek îşan bînî serê xwe;
Û piştî ku te ewende fersend daye merivê xwe,
Hîn zêde dahfdana wî bêtevdîrî ye ji bo te,
Divê tu bidostanî bidorê kevî wî bînî rê.

ORGON

Heyhat! li paş perdeyeke dînî bi zarekî ewende şêrîn
Mîrov dilekî ewçend reş, ruhekî ewqas kirêt veşêre!
Û min, ew gava ji nêza dîmir, li parsê digeriya girt anî...
Tiştê ku hûye çûye, ez êdî qencyê bi kesekî welê dikim tucarî:
Ji niha û pê ve ez ê bi nefreteke erjeng li wan binêrim.
Û ew ê weke cinnê ji hesin bitirse ji min dûr herin.

CLÉANTE

Hêmin be! zû hêrs mebe, bîhna xwe teng meke!
 Di her karê xwe de welê xwe bêcîrr meke;
 Aqilê te, rîya rast çî ye, qet hîra wê nabe,
 Û hedê xwe zanibe, her rojê bi ber bayê hinekan mekeve.
 Tu çewtiya xwe dibînî, û baş bizane ku ji ber tehfetê te
 Herkes dikare henekê xwe bi te bike;
 Lê ji bo tu kêmasiyên xwe rast bikî,
 Divê tu çî bikî ku şaşîyeke hîn mestir nekî,
 Û weke zikreşekî ku nehêjaye pênc peran
 Bi agirekî neşewitînî sextekar û hemî mominan?
 Wekî din çî? ji ber ku durûyekî te biwaweylê
 Û curetkariyeke mexrûr xapandiye,
 Tu dixwazî ku em jî xwe weke wî bikin
 Û bêjin ku dilsozê Xwedê peyda nabin roja îroyîn?
 Tu ji bêdîn û îmanan re bihêle van encaman;
 Rûmeta rastî cihê bike ji texlîtan,
 Qet ecele meke ji bo biryar danê,
 Û heta ji te bê, bibîrewerî bide biryarê:
 Xwe ji delewêreyên qılıçan bi parêze, heta ji te bê,
 Lê bi sofî û mominên rasteqîn re jî kufir mebe;
 Û ger ku bivê tu zêde pê de herî,
 Ji dêvla ku tu bi mominekî re kufir bibî, qedrê qiliçekî bigrî çêtir e.

Sehneya Duddyuan
 (Damis, Orgon, Cléante)

DAMIS

Çawa? bavo, rast e ku ev bēnamûs gefan li te dixwe?
 Nexwe, hemî qenciya ku te pê kiriye bi tiştekî hesab nake,
 Û vî sersemê ku ji zû de lēxistineke baş heq kiriye,
 Hemî qenciya ku te pê kiriye bi xirabî li te vedigerîne?

ORGON

Erê, lawê min, û agirê ku wî bera nava min daye nayê salixdan.

DAMIS

Tu wî ji min re bihêle, ez ê herdu guhên wî di ber de jêkim:
Divê ez van bitrîtiyên wî bêşerefi jê re nehêlim;
Ev karê min e, ez avê lê venaxwim,
Ez ê me ji vê belayê xelas bikim,
Û ji bo ku em jê rizgar bibin, divê ez aniha mêjiyê wî belav bikim.

CLÉANTE

Eve, birastî jî helal be ji te re, naşî hemî divê weke te bin!
Sebir bikin, ez ricayê dikim,
Vê heyecan û hengameyê bicîh bihêlin:
Em di dewr û demeke welê de dijîn
Ku bi zorê tu mesele çareser nabin.

Sehneya Sisiyan

*(Sîtî Pernelle, Mariane, Elmier,
Dorîne, Damis, Orgon, Cléante)*

SITÎ PERNELLE

Çi dibe, çi diqewime? Ez li vir sirrên erjeng dibihîzim.

ORGON

Min bûyer ji serî heta binî bi çavên serê xwe dît,
Çawa heqê qenciya min da min eve te jî dît.
Ez mêrik ûnim tevli hejariya wî di mala xwe de xwedî dikim,
Ez wî weke birayê xwe yê rastî biser û cil dikim;
Her roj çî qenciya ku ji destê min bê ez ji bo wî dikim;
Ez keça xwe û hemî hebûna xwe jê re diyarî dikim;
Ev bêşeref û muxenet jî di eynî wextê de,
Tu ji xwe re li vê bextereşiyê, dixwaze jina min ji rê bibê,
Û ev bênamûsî jî hîn çavên wî yên birçî têr nake,
Dixwaze bi saya qenciya ku min pê kiriye min tehdîd bike,
Û ji malwêraniya min ji xwe re îstifade bike

Qenciya min li hember min weke çek bikar tîne,
Bimal û milkê ku min dayiyê dixwaze min bixe
Rewşa ku min ew herî jê rizgar kiriye.

DORINE

Weyla rebenî!

SITÎ PERNELLE

Lawê min, ez bawer nakim
Ku ew dê karibe karekî welê kirêt bike.

ORGON

Çawa tu bawer nakî?

SITÎ PERNELLE

Hertim mirov ji qencên Xwedê diheside.

ORGON

Dayê, tu dixwazî bi van peyvan çî bêjî.

SITÎ PERNELLE

Ez dibêjim ku kufletê mala te bi awayekî seyr dijî,
Girrê herkesî jê tê tu jî vê yekê dizanî.

ORGON

Çî pêvendiya vî girrî û tiştê ku ez dibêjim heye, tu ji min re nabêjî?

SITÎ PERNELLE

Belbî min sed carî ji te re got, wextê tu piçûk bûyî:
Li ser rûyê dinyê rûmet herdem bûye sedemê girr avêtinê;
Mirovên hesûd ku roja wan tê dimrin, lê hesûdî her dimîne.

ORGON

Rast e, lê çî eleqa vê bi mesela ku em xeber didin heye?

SITÎ PERNELLE

Kî dizane, niha di derheqê wî de bisedan derew li te kirine.

ORGON

Ez ji te re dibêjim min bi çavê serê xwe diye ku çi dike.

SITÎ PERNELLE

Kesê ku peyvê hibe û bîne dikare her xirabiyê jî bike.

ORGON

Tu mirov dîn dikî, dayê.

Ez ji te re dibêjim ku min bi çavê xwe diye

Ku çawa bicuretkarî çi sûc kiriye.

SITÎ PERNELLE

Zimanê xelkê vala nasekine, hertim jahrê direşîne,

Ez heyrana wî me ku karibe xwe ji derewên xelkê bistirîne.

ORGON

Ev peyv û şîretên vala bêmane ne.

Min ew dît, ez dibêjim, min dît, bi çavên serê xwe,

Mana dîtîne çi ye: ma ez ji te re li defê bixim

Di guhê te de bêjim, û sed carî bihawar kim.

SITÎ PERNELLE

Tu Xwedê, divê tu bi tiştên li ber çavan nexapî:

Divê tu hergav li tiştên xwiya menêrî û biryar medî.

ORGON

Qey tu dixwazî min dîn bikî?

SITÎ PERNELLE

Mirov herdem dikare bikeve şikên vala,

Û qencî weke xerabiyê tê dîtin gellek caran.

ORGON

Qey divê ez daxwaza maçîkirina jina xwe
Ji alî wî ve weke dilovaniyê bibînim xwene?

SITÎ PERNELLE

Sebebên biheq divên,
Ji bo mirov tawanbar bike hinekan;
Ji bo amin bûbûya diviya tu rawestiya hinekî din.

ORGON

Ji bo Xwedê! ji bo ez baş amin bûbûma?
Nexwe, dayê, diviya ez li benda wî bûma
Ku li pêş çavê min jina min... Tu dikî min bi zorê bipeyivênî.

SITÎ PERNELLE

Xwiya ye ji mihebeteke paqij mitesîr bûye, çi dibe lawê min;
Kî ji min re vê yekê bêje qet nakeve serê min
Ez ji tiştên ku hûn dibêjin ebeden bawer nakim.

ORGON

Heydê, ez nizamim, ku tu ne diya min bûna,
Te ez teqandim, ez dizanim ku min ê ji te re çi bigotana.

DORINE

Dinya bi dor e, Mîrza, çerxa felekê geh li jêr e geh li jor e:
Te qet ji me bawer nedikir, îjar ew jî ji te bawer nake.

CLÉANTE

Li şûna ku em bi vê minaqeşê wexta xwe derbas kin,
Çêtir e ku em ji xwe re ray û tevdîrekê bikin.
Divê em li hemberî tehdîdên vî hîlebazî qet di xew ve neçin.

DAMIS

Te got çî? Bitrîtiya wî gîhaştiye heta vê radeyê jî?

ELMIRE

Ez bawer nakim, ku ew ê karibe vê bitrîtiyê bike.
Û mirov ancax ewende nankoriyê bike.

CLÉANTE

Guhdariya van peyvan mekin: Ew ê ji xwe re riyekê bibîne
Ji bo pišta xwe çêke û ji we re mahnan derxîne;
Û ku welê ji neke, bi fenan li mehkemê
Tim dikare serê mirov têxe teşqelê.
Ez ji we re careke din dibêjim:
Ku hûn çekên destê wî hesab nekin,
Hûn nikarin tişteki biqendî serê derziyê ji pê bikin.

ORGON

Ev yek rast e; lê çare? Qurretiyên vî bênamûsî,
Ewende min têşînin ku ez nema karim ji ber wan îdare bikim.

CLÉANTE

Ez, ji dilê sidqane, dixwazim ku navbera we çêbibe,
Hûn li hev bîn û bi awayekî aşitiyane ev pirs çareser bibe.

ELMIRE

Ger min zanibûna ku çekên welê di destê wî de hene,
Min jî, birastî ranedikir ewende hêwerzê û welwele,
Him min...

ORGON

(Dibîne ku Loyâl dikeve hundir ji Dorinê re dibêje.)
Ev mêrik çi dixwaze? Heyclê zû here binêre bê çi dixwaze.
Jixwe niha tam wexta ku hinek bîn seredana me ye!

Sehneya Çaran
(*Mîrza Loyal, Sifî Pernelle, Orgon,*
Damis, Mariane, Dorine,
Elmire, Cléante)

MÎRZA LOYAL

Rojbaş, xwişka delal; ji kerema xwe re,
Min bibe cem Mîrza, ez dixwazim xeberdim pê re.

DORINE

Niha mêvanê wî hene,
Ez bawer nakim ku bixwaze kesekî din bibîne.

MÎRZA LOYAL

Ez jî nehatile vir ku wî bipeyvên vala aciz bikim.
Ez dibêm qey, bi hatina xwe, ez ê wî kêfxweş bikim;
Ez ji bo karekî xêrê hatime ku dilê wî hînik bikim.

DORINE

Navê te bixêr?

MÎRZA LOYAL

Jê re bitenê bêje,
Ku Mîrza Tartuffe, ez ji bo qenciya wî şandime.

DORINE

(Ji Orgon re dibêje)

Mirovê ku hatiye, pir kulbar û nazik e,
Dibêje, ji bo karekî bixêr, Mîrza Tartuffe ez şandime,
Li gor gotina devê wî, dê te pir memnûn bike.

CLÉANTE

Divê tu biçî binêrî bê kî ye
Ev mirov, û tiştê ku ji te dixwaze çi ye.

ORGON

Ji bo me lihev bîne hatiye belbî: Ez nizanîm,
Ez dikarim jê re çi bêjim?

CLÉANTE

Dilgiranî û kerba xwe qet diyar meke;
Ger bahsa lihevhatinê bike, guhdariya wî bike.

MÎRZA LOYAL

Merheba, Mîrza.
Xwedê bela kesê ku bixwaze xerabiyê bi te bike bide,
Û wek herkesî ez jî dixwazim ku Xwedê hertîm alîkarê te be!

ORGON

Ev destpêka xweş bi min jî baş û xweş e,
Û divê nîşan û elameta lihevhatinê be.

MÎRZA LOYAL

Mal û malbata te li ber dilê min tim şêrîn e,
Û demeke dirêj min xizmeta Mîrzayê bavê te kiriye.

ORGON

Mîrza, ez ji te fedîkar im û dawa lêborînê dikim,
Min tew bîrnebir ku te nas bikim û pîrsa navê te bikim.

MÎRZA LOYAL

Navê min Loyal e, ez li Normandiya ji diya xwe bûme,
Û ez naxwazim, lê ez yek ji wan mibaşîrên dest bidar im.
Mala Xwedê ava, ev serê çil salî ye, ku ez vî karê birûmet dikim
Ez ji ber vê yekê jî gellekî serbilind û bextewer im;
Û bimisada te be, Mîrza, ez niha jî hatim
Biryareke mehkemê bi te ragihînim...

ORGON

Çi? tu hatî vir...

MÎRZA LOYAL

Mîrza, hêrs mebe:

Ev ji agadariyeke mehkemê pê ve ne tişteki din e,
Fermanek e, ji bo derkirina we û valakirina malê
Ji xwe re li cîhekî din bigerin, û alavên xwe derxin derê,
Xwe vir de wê de medin, zû vala bikin, ji ber ku lazim e...

ORGON

Ez, ez ê ji malê derkevim?

MÎRZA LOYAL

Erê, Mîrza, ji kerema xwe re.

Wek tu jî dizanî, mal ji niha û pê ve,
Bêguman, êdî mal a Mîrza Tartuffi ye.
Li gor vê peymanê ku di destê min de ye,
Ew ji niha û pê ve xwediyê mal û milkê te ye:
Li gor qanûna heyî tu îtirazeke ku tu bikî tune ye.

DAMIS

Birastî jî mirov ewende dikare bêşerm û heya be,
Ez heyrana wî me.

MÎRZA LOYAL

Mîrza, tu karekî min ê ku bi we re hal bikim tune ye;
Îşê min bi Mîrza diqede: mirovekî hîrbir û sernêrm e,
Û ew baş dizane ku divê li dijî edaletê dernekeve,
Qanûn çi ye, ne çi ye wê jî baş û qenc dizane.

ORGON

Lê belê...

MÎRZA LOYAL

Erê, Mîrza, ku milyarên we jî herin
Ez dizanim hûn tucarî dengê xwe nakin,
Divê hûn li ser qedr û rûmeta xwe cezayê xwe bikşînin,

Û ji bo cîbicîhkirina vê fermanê tu probleman dernexin.

DAMIS

Mibaşir begê dest bidar, nebe ku darê destê te,
Dawêşîne tozê ji vî cubê reş ê li bejn û bala te.

MÎRZA LOYAL

Ji lawê xwe re bêje yan bila hiş be yan jî bila ji vir biçe,
Mîrza. Nexwe dê min mechûr bike Ku zeltekê çêkim di derheqê
wî de,
Û navê te jî binivîsim bixim eynî zebtê de.

DORINE

Ev Mîrza Loyalê, ku mana navê wî durust e,
Ew bixwe nedurust xwiyaye.

MÎRZA LOYAL

Ji mirovê qedrê xwe zane re gellek rêz û hirmeta min heye,
Û ger ku min karê ragîhandîna vê fermanê daye ser xwe,
Mîrza, min ji bo qencî û kêfxweşiya we wiha kiriye,
Ku li şûna min kesekî din bihata mala we
Dê wek min xîret nekira ji bo te
Û bi awayekî rûşûştî we derxista derve.

ORGON

Ma tiştekî hîn xerabtir ji fermana, ku mirov însên
Ji mala wî derxe, bavê kolane heye?

MÎRZA LOYAL

Ez niha rojekê mohletê didim we,
Û heta sibê vî çaxî ez ê dîsa hêm cem te,
Mîrza, ji bo cîbicîhkirina fermana destê xwe.
Ez dixwazim bitenê hêm li vir bibuhêrim şeva xwe,
Bêrezalet û bêqerebalixî, li gel deh mirovên xwe.
Ji bo em li gor mewzûtetê hereket bikin, rica min ji we heye,

Divê berî razanê, hûn bidin min hemî miftên deriyên xwe.
 Ez ê hewl bidim ku kesek rihetiya we xira meke,
 Û li hember we tevgereke nelirê meke.
 Lê, divê hûn hemî cil û bergên xwe lixwe bikin serê sibê
 Tiştekî biqendî serê derziyê jî nehêlin, vala bikin malê:
 Dê mirovên min alî we bikin, min yên herî bihêz anîne,
 Da ku alîkariya we bikin û derxin derve hemî alavên we.
 Ez dibêm qey, kesek ji min baştir nikare tiştekî welê bike;
 Û weke ku ez gellekî hêsan dikim karê te,
 Ez jî hêvî dikim, Mîrza, ji bo ez baş bicîh bînim karê xwe,
 Divê hûn rê nedin ku kesek bibe mani
 Da ku ez pêk bînim vezîfa xwe.

ORGON

Ji dil û can min ê aniha bidana
 Ev sed zêrên dawîn ku li ber destê min mane,
 Ku min karibûna kulmeke bişid li serçavê vî bînamûsî bidana
 Dil û nava xwe lê rihet û hînik bikirana.

CLÉANTE

Raweste, da ku em karê xwe bidestê xwe xera nekin.

DAMIS

Ev vî ev ceger ji ku girtiye ez nizanî,
 Ez bizorê xwe digrim, nema bixwe karim.

DORINE

Wellehî, pişta te ne ji xweşî latekê fireh e, Mîrza Loyâl,
 Çend derb darên baş lêketa, min ê bigota oxweş û helal.

MÎRZA LOYAL

Ez dikarim ji bo van peyvên te yên çort te ceza bikim,
 Keça min, êdî di derheqê jinan de jî zebit tînin girtin.

CLÉANTE

Dev ji van peyvan herde, Mîrza: êdî bese;
Tika ye, ka zû vê kaxezê bide, û me bitenê bihêle.

MÎRZA LOYAL

Hete careke din em hev dibînin.
Xwedê we şad û bextewer bike.

ORGON

Xwedê bela te, û yê ku te şandiye vir jî bide.

Sehneya Pêncan

*(Orgon, Cléante, Mariane, Elmire,
Siti Pernelle, Dorine, Damis)*

ORGON

Îja çawa ye, tu tiştê ku dike dibîni, dayê, ne wek min bû,
Hema ji vê yekê de pê de here tu yê wî baş nas bikî:
Bênamûsekî çawa ye, êdî te jî ew naskir?

SITÎ PERNELLE

Bi rastî ez nizanim ku ez ê çi bêjim, mirov ji diyaran de dikeve!

DORINE

Na na, heqê te tune tu giliyê wî bikî,
Tu beleheq navê wî xirab dikî,
Jixwe hemî tiştên ku dibin jî, sofîti û momintiya wî teyid dikin:
Rûmeta xwe
Ji bo hezkirina li hemberî hemcinsên xwe nîşan bide bikar tîne;
Dizane ku gellek caran dewlemendî mirov dixirêne, ji rê dibe,
Û birastî jî ji bo qenciya we, dixwaze ji we bistîne
Hemî tiştên ku dikarin bibin asteng li pêş silametiya we
Û we ji wan xelas dike.

ORGON

Hiş be: tu difna xwe nexî hertiştî, di her girarê de nekêlî nabe.

CLÉANTE

Heydê em binêrin bê em ê ji we re kijan parêzerî bigirin.

ELMIRE

Herin jiserxweçûyîna vî nankorî li herderê belav bikin.
 Hikmê peymaneke welê neheq û bêrê ji navê rakin;
 Û ev delewêreyên wî clê dilê herkesî jê bihêlin,
 Di vî karê ku em dibên qey biser ketiye de
 Dê nehêlin biser keve.

Sahneya Şeşan

*(Valère, Orgon, Cléante, Elmire,
 Mariane, hwd.)*

VALÈRE

Ji ber ku min ev xebera reş aniye, mîrza, ez xemgîn im;
 Lê ji ber xetera nêzîk ez xwe mecbûr dibînim ku bêjim.
 Dostekî min ê ku gellekî hez dike ji min,
 Û ku baş dizane peyvendiye navbera we û min,
 Karekî mezin kiriye ji bo xatirê min,
 Eşkere kiriye sirra nehîni ya dewletê
 Ji min re xeber şandiyê li bayê bezê
 Dibêje, ku divê tu xwe bialîdî ji ber vê xezebê.
 Wî sextekarê ku ev demeke dirêj e, li te hikum kiriye
 Berî saetekê, li bal Mîr giliyê te kiriye û te tawanber kiriye,
 Û daye destê wî, sendoqa belgeyên girîng ku firarekî dewletê
 Ji bo tu wê veşêrî li mala xwe dabû te,
 Gotiye ku, te bi awayekî ku bihevvelatîyekî nakeve,
 Ev sendoqa belgeyan hiştiye li cem xwe.
 Ez nizanîm kitekitên cirna ku dixin situyê te;

Lê ferman hatiye dayin ji bo girtina te;
Û ji bo ev emir pêk bê, wî bixwe daye ser xwe
Ku hevkarîya kesê bê te bigre bike.

CLÉANTE

Eve bênamûs ji xwe re mahne ji dît; ku bide ber rûyê xwe
Da ku bêtirs xwedî derkeve li mal û milkê te.

ORGON

Ev zilam, birastî jî, seyekî harî hêberî ye!

VALÈRE

Tu hinekî din ji dereng bimînî tu ji destê wan xelas nabî.
Min ji bo te ereba xwe hazirkiriye aniye ber derî,
Min hezar zêr jî ji te re xistiye vî kîsî.
Divê em qet dereng nemînin: Hespên min wek brûskê ne
Û ji bezê re gellekî jîr û jêhatî ne.
Heta ku te bighînim cîhekî ewle, ez amademe li ber emrê te
Û ji bo tu xwe bidî alî ez dixwazim rêberiyê bikim ji te re.

ORGON

Heyhat! ez deyndarê vê qenciya te me!
Niha newexta ku em ji hev re bêjin vê yekê;
Ez ji Xwedê dixwazim ku rica min qebûl bike
Ji bo ku ez karibim li te vegerînim vê qenciya te.
Bixatirê we: hemî li xwe miqate bin...

CLÉANTE

Zû biçin:
Birawo, tiştê ku li vir lazim be em ê bikin.

Sehneya Dawîn
(*Zebtiye, Tartuffe, Valère,*
Orgon, Elmire, Mariane, hwd..)

TARTUFFE

Ecele meke, Mîrza, hêdî be, welê zû melezîne:
Ji bo tu ji xwe re quleke ku tu xwe tê de veşêrî bibînî,
Nehewceye ku tu ewende dûr biçî, him bi biryara Mîr tu dibî girtî.

ORGON

Bênamûs, te ji bo min hiştibû dawiyê ev bênamûsî;
Tu bi vê derba xwe, bêşeref, min mehû dikî,
Û eve tu xerabiya dawîn bi min dikî.

TARTUFFE

Ez li ber dijûnên te qet nakevim,
Û ji bo xatirê Xwedê ez ê tehemil bikim.

CLÉANTE

Divê mirov îtîraf bike, ku bîhna te pîrr fire ye.

DAMIS

Tu dibêjî qey ji Xwedê de bûye sembola kirêtî û çortiyê!

TARTUFFE

Ev hemî hêrs û kerba te jî qet tesîrê li min nake,
Ji wezîfa min pê ve tiştêkî din ne li ser guhê min e.

MARIANE

Tu dikarî ji xwe re vê yekê wek serketinekê bibênî,
Û vî karî ji xwe re weke tiştêkî pîrr bişeref bihesibênî.

TARTUFFE

Tiştêk ji karê ku mirov ji alî meqamekî bilind ve
Hatibe wezîfedar kirin biqîmet û rûmettir tuneye.

ORGON

Hiş be nankor, ma te çi zû jibîra kir ku,
Tu bi xêra pariyê nanê min ji hejariyê xelas bûyî?

TARTUFFE

Erê, ez dizanim ku te çi qencî û alîkarî bi min re kiriye;
Min ev yek ji bîra nekiriye,
Lê berjevendiya Mîr ji bo min berî hertiştî ye;
Ev kar û wezîfa pîroz zorê dide mêzêna dilê min
Ku ez tu qencî û alîkariyê bitiştêkî nehesibînim,
Û ji bo karekî welê pîroz ez bêferîqet dikarim
Dost, jin, xizm, û heta xwe jî bi wan re feda bikim.

ELMIRE

Çellaq, sextekar!

DORINE

Wek fisa şeytên, çawa di'zane,
Kirêtiya xwe li paş tiştên birûmet veşêre,

CLÉANTE

Lê ma'dem tu welê dibêjî ku tu ewende paqijî,
Tu vê yekê didî ber rûyê xwe ku tu hevvelatîyekî sadiqî,
Tu çima li benda wexta hayê wî
Ji te çêbû ku tu li pey jina wî digerî,
Û ji bo namûsa xwe biparêze gava xwest tu ji mala wî herî
Mayî û te xwest ku giliyê wî bikî?
Ez vê yekê ne ji bo ku dev ji mal û milkê wî,
Yê ku hîbeyî te kiriye herdî dibêjim;
Lê tu çima malê kesekî
Ku tu îro wî bixiyanetê tawanbar dikî qebûl dikî?

TARTUFFE

(Vedigere ser mêrikê zeptiye.)

Mîrza, min ji vê welweleyê xelas bikin,
 Û tikaye, fermana ku hatiye dayin cîbicîh bikin.

ZEPTIYE

Erê, birastî jî ez ji bo cîbicîhkirina wê gellekî dereng mam:
 Te bi devê xwe, tam jî di wexta wê de xwest ku ez wê pêk
 bînim;
 Ji bo ku ez vê fermanê pêk bînim
 Zû bide pey min da ku ez te bibim zindana
 Ku tu lê bimînî.

TARTUFFE

Çi? Mîrza, ez bidim pey te?

ZEPTIYE

Erê, tu.

TARTUFFE

Baş e, çima ez ê bikevim hefsê?

ZEPTIYE

Ku tu ji min dipirsî, ez ne mecbûrim hesab bidim te.
(Vedigere ser Orgon.)
 Bîhna xwe fireh bike, Mîrza, nehewcêye ku tu biqeliqî.
 Em li bin desthilata Mîrekî ku dijminê derewîna ye dijîn,
 Mîrekî welê ku niyeta dilê herkesî çî ye dizane,
 Û ku bidek û dolabên çellaqan tucarî naxape.
 Bipêşbîniyeke tûj û bihawayekî bêkêmasî
 Kî layiqê çî be, heqê herkesî dide wî;
 Qîmetê tu tiştêkî ji layiqê wî bêtir tune ye li cem wî.
 Û mentiqê wî yê ku şaş nabe, zêdegaviyê nake tucarî.
 Rûmeteke mezin dide xêrxwaz û mominan;
 Ne biawayekî çavgirtî, lê bizanebûn teşwîq dike xîreta wan,
 Û evîna hemî qencên Xwedê ku xêrnexwaz dixwazin

Wan bitirsînin tucarî ji dilê wî dernakeve.
 Heta ku dor hate wî gellekên din di ser de hatin girtin,
 Hîn gellek xefik û dafên din ji alî Mîr ve hatin qetandin.
 Bi saya fikrên xwe yên tûj, berî herkesî
 Hemî kirêtîyên Tartuffe derxistin holê.
 Gava xwest ku te tawanbar bike, sûcê wî derket holê,
 Ê bi saya elametên rasteqîn ên edaleta îlahî,
 Li pêş Mîr derket meydanê ku sextekarekî bi du navan e,
 Ê ku bi navekî sexte gellek delewêre kirine;
 Kitetita çîroka karên wî yên kirêt dûvdirêj e
 Ne di kitêban hiltê ne ji kes kare bibilîne û bibêje.
 Welhasil, Hikumdar, ji nankorî û bênamûsiya ku wî bi te re kir
 Gellekî zivêr bû û nefret kir;
 Ji bo zanihe ku xerabiyên wî yên din dê bighên çi radeyê,
 Ez bi raterqa wî xistime.
 Da ku zanihe bê xirabkariya wî dighê heta ku,
 Ê ji alî wî ve serbestî ku çî bikî tu
 Erê, hemî kaxezên te, Begê me dixwaze,
 Ku ez li ber çavên te, ji vî qeşmerî bistînim û bidim te.
 Peymana ku te pê hemî mal û milkên xwe dabûyê,
 Bi fermanekê betal dike,
 Ê rewşa nexweş a ku tu ji ber firara hevalekî xwe
 Ketibûyê biawayekî vekirî efû dike;
 Ê vê jî wek xelatekê ji bo qenciya te
 Ya ku te demekê pê kiribû dihesibîne,
 Da ku dilovaniya xwe nîşan bide, ku gava mirov piçekî lê bifikire,
 Bi awayekî pîrr qenc mirov di nav xêr û bêrê de dihêle,
 Qenciya kesên hêja tucarî wenda nabe li bal wî,
 Ê ji xerabiyê bêtir qencyê ji bîra nake tucarî.

DORINE

Qe Xwedê jê razî be!

SITÎ PERNELLE

Îjar bîhna min hate ber min.

ELMIRE

Heq cîhê xwe dibîne!

MARIANE

Ev yek dihat bîra kê?

ORGON

(Li Tartuffe vedigere.)

Oxweş! tu gîhaştî heqê xwe, bêşeref...

CLÉANTE

Ax! birawo, raweste,

Û xwe meke hevalê kesên bêheysiyet û hêrûmet;

Bihêle bila ev hejar bighê misteheqê xwe,

Û tu qet xwe pê meke şeytan çê be di ezêb de:

Berevajiya vê heta ji te tê dia bike ku îro

Piçekî rehm têkeve dilê wî û bi awayekî birûmet li xwe vegere,

Ku ji kêmasiyên xwe şerm bike û jiyaneke nû ji xwe re hilbijêre

Da ku Mîrê mîran zêde lê neyê xezebê,

Di vê navê de ji bo xatirê qenciya wî tu jî biçe huzûra wî

Ji bo xatirê dilovaniyeke welê,

Bike her çi qenciyek ku ji destê te bê.

ORGON

Erê, tu baş dibêji: heydê em biçin her piyên wî bikêfxweşî

Ji bo xatirê qenciya ku bi me kiriye em jî,

Sipasiya xwe pêşkêş bikin ji bo wî.

Paşê, piştî ku me ev wezîfa xwe ya esil pêk anî,

Bi eynî ihtîmamê divê em pêk hînin wezîfeyêke xwe ya dî,

Û bi dawet û zewaceke pirr xweş

Em evîna Valêrê dilpak û Marianê xelat bikin.

Biyografiya Molière

- 1622 *15-ê Çilleya Paşîn* - Li Parisê ji diya xwe dibe. Bavê wî yê raxer navê Jean-Baptiste Poquelin de Molière lê dîke.
- 1636-1640 Li Parisê, li koleja Clermont dixwîne.
- 1643 *30-ê Hezîranê*. - Koma xwecih a Illustre-Theatre tê avakirin. Molière paşerojê (wiha xwiya ye ku salên pêşîn ev nasnav bîkar neaniye) û Madeleine Béjart li gel hevalên xwe peymanî avakirina vê saziyê înzê dikin. Cara pêşîn, di 1-ê Çilleya Paşîn a 1644-an de, di lîska topê ya bi navê Métayers de derdikevin pêşberî hîneran; paşê di 19-ê Çilleya Pêşîn a eynî salê de derbasî koma Croix Noire dibin. Lê zêde najo kumpanya têk diçe (Molière, di navbera 2 û 4-ê Tebaxa 1645-an de, ji ber deynan dikeve hefsê). Kumpanya meçhûr dimîne belav dihe.
- 1646-1658 Molière û Madeleine Béjart derdikevin melbendê, pêşî di koma bi serokatiya Charles Du Fresne de dilîzin, ku patronê wê Duc d'Epéron e, paşê di kumpanya ku ew bixwe îdare dikin û ji 1653-yan hete 1657-an ji alî mîr Conty ve hatiye parastin de dilîzîn.
- 1655 Pêşkêşkirina *L'Etourdi*, li Lyonê.
- 1656 Pêşkêşkirina *Depit amoureux*, li Béziersê.
- 1658 *24-ê Çirtiya Pêşîn*. - Kom vedigere Parisê, û êdî ji aliyê Mîrza, hirayê Louisê XIV. ve tê parastin, li hola mûhafizên kevn a Louvrê, li pêş Louisê XIV. trajediya Corneille *Nicomède* dilîze. Paşê *Docteur amoureux* bi hin dans û sitranên piçûk ên di navbera perdeyan de ku ji alî Molière ve li melbendê lê hatibûn zêdekirin dilîze û bi saya serketina di warê komediyê de hola Petit Bourbon bi komediyênên Îtalî re par vedike.
- 1659 *18-ê Çirtiya Paşîn*. - *Les Precieuses ridicules*.
- 1660 *28-ê Gulanê*. - *Sganarelle ou le Coucu imaginaire*.

- 11-ê Çirîya Pêşîn. - Bêyî ku herf jê re bê gotin, ji aliyê M. de Ratabon ve ji teatra wî ya ku wê bê xirakirin tê derxistin, lê li heberf vê hola Palais-Royal didinê.
- 1661 4-ê Sibatê. - *Dom Garcie de Navarre ou le Prince jaloux.*
24-ê Hezîranê. - *L'Ecole des maris.*
17-ê Tebaxê. - Afrandina *Fâcheux* li Vaux-le-Vicomtê, ku dema cejnê ji alî nazir Foucquet ve ji qirêl re hate pêşkêş kirin.
- 1662 20-ê Sibatê. - Zewaca Molière û Armande Béjart, xwişk an, li gor hinekan, keça Madeleine, li Saint-Germain-l'Auxerrois. Peyman di 23-yê Çilleya Paşîn de hatibû înzê kirin.
26-ê Çilleya Pêşîn. - *L'Ecol des femmes.*
- 1663 1-ê Tîrmehê. - *La Critique de l'Ecole des femmes.*
Di navbera 16 û 21-ê Çirîya Pêşîn de. *L'Impromptu de Versailles*, li Versaillesê pêşkêş kir.
- 1664 19-ê Çilleya Paşîn. - Bûyîna Louis, lawê Molière, ku wî di 28-ê Sibatê de baptîz dike. Parrain: Qiral wî baptîz dike. Marraine: Ji alî Henrietta Ingiltereyî ve tê baptîz kirin.
29-ê Çilleya Paşîn. - *Le Mariage force*, li Louvrê hat pêşkêş kirin.
17-ê Nîsanê. - *Le Tartuffe* Kumpanya Saint-Sacrement tirsand, ev tirs jî bû sebaba ku careke din neyê nîşan dan.
30-ê Nîsanê/22-yê Gulanê. Molière û koma xwe ji bo beşdarî Plaisirs de l'Île enchantée hibe li Versaillesê bicîh dibin. 8-ê Gulanê, *La Princesse d'Élide* cara pêşîn hate pêşandan. Di 12-an de jî her sê perdeyên *Tartuffe* hatin nîşan dan.
1-ê Tebaxê. - Temamkirina çapa *Le Roi glorieux au monde*, ji alî metran Saint-Barthélemy û Pierre Roullé ve, ku bi dijwarî êrîşî afranderê *Tartuffe* dikin. Molière, dereng namîne, bi erzûhala xwe ya yekemîn reaksiyona xwe nîşan dide.

Di navbera 20 û 27-ê Îlonê de. - Her sê perdeyên pêşî yên *Tartuffe*, ji alî Moliere û koma wî ve, bi biryara Mîrza birayê wî dema ku qiral Louisê XIV. hatibû serdana birayê xwe, li Villers-Cotterêts hatin pêşkêş kirin.

29-ê Çiriya Paşîn. - *Tartuffe* bi her pênc perdeyên xwe ve li Raincy, li mala Mîr Palatine, ji bo Condé hate pêşkêş kirin.

1665 *15-ê Sibatê.* - *Dom Juan.*

4-ê Tebaxê. - Keça Molière bi navê *Esprit-Madeleine* tê batîz kirin.

14-ê Tebaxê. - Koma Moliere li Palais-Royal dibe Koma Qirêl û mehaneya wî derdixe 7 000 frankî.

14-ê Îlonê. - *L'Amour médecin* li Versaillesê pêşkêş dibe.

8-ê Çiriya Paşîn. - *Le Tartuffe* û *L'Amour médecin* li Raincy, li mala Mîr Palatine bi emrê de Condé tên pêşkêş kirin. Perdeya çaran a *Tartuffe* hîn nehatiye pêşandan, wê demê, hîn şeklê wê yê dawîn nahatibû dayin.

1665-1666 *Ji dawîya meha Çilleya Pêşîn heta dawîya Sibatê.* - Molière nexweşê bêhal e. Di Nisana 1667 de sipî sax dibe.

1666 *4-ê Hezîranê.* - *Le Misanthrope.*

6-ê Tebaxê. - *Le Medecin malgré lui.*

2-yê Çilleya Pêşîn. - Li Saint-Germain-en-Layeyê, Pêşkêşkirina *Mélicerte*, bi tenê wek du perde di *Ballet des Musses* de cîhê xwe girt û di 5-ê Çilleya Paşîn a 1667-an de ciyê *La Pastorale comique* girt, ku îro wendaye. 10-ê Sibatê dişa li Saint-Germainê û bi kadirên eynî baleyê, pêşkêş kirina *Sicilien ou l'Amour peintre.*

1667 *5-ê Tebaxê.* - Li Palais-Royal, carekê bitênê pêşkêşkirina *L'Imposteur*, dotira rojê hat qedexekirin. La Thorillière û La Grange wê gavê li gel erzûhala Molière çûn giliyê xwe li bal qiralê ku nû dora Lillê girtibû kirin.

11-ê Tebaxê. - Sermetranê Parisê Hardouin de Péréfixe,

fermanekê derdixe û dibêje her kesê ku vê lîskê "bi taybetî an bi awayekî eşkere hilîze, bixwîne an dema bê ravekirin guhdarî bike dê ji dîn bê derxistin (aforoz kirin)."

20-ê *Tehaxê*. *Lettre sur la comédie de L'Imposteur*, nameya anonîm di lehê Molière û piyesa wî de.

1668

3-ê *Çilleya Paşîn*. - *Amphitryon*.

4-ê *Adarê*. Molière li hotêla de Conde, Le Tartuffe ji bo Monsieur le Prince dilîze.

15, 16, 18 an jî 19-ê *Tîrmehê*. - *George Dandîn*, li Versaillesê, bi kadirên *Grand Divertissement Royal* hate pêşkêşkirin.

9-ê *Îlonê*. - *L'Avare*.

20-ê *Îlonê*. - *Le Tartuffe* li Chantilly ji alî Molière ve, ji bo Condé hate lîstin.

1969

5-ê *Sibatê*. - Tartuffe tê serbestkirin û li Palais-Royal tê nîşandan. Serketineke bêhempa bidest dixê. Dîsa eynî rojê, Molière erzûhala xwe ya sisiyan ji Qirêl re şand. Komediya ku ji alî Jean Ribou ve hate weşandin, dê di 23-yê Adarê de ji çapê derketa (di 15-ê Adarê de derket).

4-ê *Nîsanê*. Molière çapa *La Gloire du Valde-Grâce*, ku ji bo wê dostê xwe yê nîgarkêş Mignard kirêkiribû temam dike.

6-ê *Çiriya Pêşîn*. *Monsieur de Pourceaugnac*, cara pêşîn li Chambordê hate lîstin.

1670

La Critique du Tartuffe, komediya anonîm, li gel *Nameyeke satîrîk a li ser Le Tartuffe ku ji nivîskarê Rexneyê re hatibû nivîsîn*, li Parisê, li cem Gabriel Quinet tê dîtin (Bi tarîxa 19-ê Çiriya Paşîn 1669).

4-ê *Sibatê*. - *Les Amants magnifiques*, bi munasebeta karnevala li Saint-Germain-en-Laye hate pêşkêşkirin.

14-ê *Çiriya Pêşîn*. - *Le Bourgeois gentilhomme*, li Chambordê tê lîstin.

- 1671 17-ê *Çiriya Paşîn*. - Pêşkêşkirina *Psyché*, li hola des Tuileries.
 24-ê *Gulanê*. - *Les Fourberies de Scapin*.
 2-yê *Çilleya Pêşîn*. - *La Comtesse d'Escarbagnas* cara pêşîn li Saint-Germain-en Layeyê hate pêşandan, perdeyek ji bo destpêka *Ballet des ballets* hate amadekirin.
- 1672 11-ê *Adarê*. - *Les Femmes savantes*.
 1-ê *Çiriya Pêşîn*. - Babtîzkirina Pierre-Jean-Baptiste-Armand Poquelin, lawê Molière. Lawikê nûbûyî di 12-ê eynî mehê de dimre û tê veşartin.
- 1673 10-ê *Sibatê*. - *Le Malade imaginaire*.
 17-ê *Sibatê*. - *Le malade imaginaire* cara çaran hate pêşandan. Moliêrê ku rolê Argan girtibû ser xwe, li ser sehnê dikeve dilê wî lê diçe, piştî ku wî radikin tînin mala wî ya li kolana Richelieu bi çend saetan dimre. Keşeyê Saint-Eustacheyê veşartina wî ya li gor adetên xiristiyanî red dike. Li ser rica jina wî Armandeyê ji Louisê XIV. li Versaillesê, Molière bi şev, bêseremonî û qerebalixî, li goristana Saint-Josephê tê veşartin.
- 1682 30-ê *Hezîranê*. - Çapa di ber çavan re derbaskirî, sererastkirî û berfirehkirî ya *Les Œuvres de Monsieur de Molière* (Kulliyata Molière), weke çar bergan, bi aweyekî tekûz û bi pêşgotineke girîng ji alî La Grange û Vivot ve hate temankirin. Du bergên din ên ku ji herhemên wî yê neçapkirî pêkhatibûn jî di 31-ê Çiriya Pêşîn de hatin çapkirin.



Sofiyekî sextekar ku malxwê malê ji dilê xwe yê saf pê bawer dibe û dixwaze pê re alîkariyê bike dikeve nav malbata Orgon; heta ku diz û xwediye malê bi hev dihesin sofiyê min û te dixwe, vedixwe û bi rûyekî rûşûstî bela xwe di kevaniya malê dide.

Molière ku vê yekê dike mijara piyesa xwe, ji bo ku wê bi derdorên serayê û dêrê bide qebûlkirin heta sala 1669-an têdikoşe, ji ber ku gava cara pêşîn li Versaillesê tê nîşandan, piyese ji alî eynî derdoran ve weke piyeseke xeter tê dîtin û demeke dirêj tê qedexekirin. Ger Molière bitenê durûtiyên sofîtiyê jî teswîr bikira, gelo dê dîsa şik û şibhe nehata ser sofîtiya rasteqîn?

Jixwe fêda û qezenca vê piyese ewende mezin e ku; durûtiya nava mirov a ku li gor demê reng diguhere û bi awayekî din xwe nîşan dide jî derdixe meydanê. Lê Tartuffe her wiha jî komediyeke xwiya û kesayetiye ye, ku pêkeniya qebe hêdî hêdî ber bi diramê ve dibe û pê re pirr xweş harmonise dibe. Molière li vir bi hostayî û hunerê xwe yê ku mirov heyran û hişmetkar dihêle nîşan dide û bînerê ku saf saf bi heyecaneke pirr xweş dikene, jîdil kêfxweş bûye ber bi fikr, hizir û ramanên pirr ciddî, yên kûr û dûr ve dibe.

